

Şair, Dengbêj, Sazbend û Aşiq: Nêrînek li Termînolojiya Îcrakarên Edebiyata Kurdî ya Devkî

Ömer Delikaya¹

Şair, Dengbêj, Sazbend ve Aşiq: Sözlü Kürt Edebiyatında İcracılar için Kullanılan Terminolojiye Genel Bir Bakış

Öz

Son yıllarda sözlü Kürt edebiyatında öne çıkan anlatı türlerinden olan dengbêj(î) sıklıkla işaret edilen ve farklı bakış açıları çerçevesinde geleneğin ifade ettiği olguları açıklamak için yorumlanan kavramlar arasında yer almaktadır. Akademik ve kültürel ilgi odağı haline gelen dengbêjî geleneği hiç olmadığı kadar görünür hale geldi ve dengbêj kavramı tarihsel bağlamda kendini o adla tarif etmeyen diğer sözlü anlatıcılar için de işlevsel ve kapsayıcı bir şemsiye kavrama dönüştü. Özellikle 1960'lı yıllardan itibaren elektronik kültür ortamında da yaygınlaşan dengbêjî zamanla dengbêj tipi bazı bölgesel icracılar arasında da yaygınlaştı. Bu çalışma kapsamında "dengbêj" kavramındaki "deng" ve "bêj" in anlamsal çağrışımları, yapısal özellikleri, sanatın icra biçimi ve içeriğine dair sundukları farklı anlamlar incelendi. İcra edilen sanata karşılık gelen "dengbêjî" kavramı etrafında cereyan eden akademik tartışmalar çerçevesinde "şair", "sazbend", "aşiq" "kilamcı", "begzade", "mitirb" vb. gibi isimlendirmelerin kullanımları ve çeşitli kavramların bölgesel farklılıklarına açıklık getirildi. Bu bağlamda, çalışmanın amacı Kürt sözlü anlatı geleneğine ve geleneğin bölgesel farklılıklar gösteren temel kavramlarına "sahadan" veriler ile ışık tutmak ve dengbêj(î) ve diğer bazı temel isimlere yüklenen çok katmanlı anlamları tartışmaya açmaktır.

Anahtar Kelimeler: Dengbêj(î), Kilam, Kürtçe, Dengbêj, Sözlü Edebiyat.

Şair, Dengbêj, Sazbend and Ashiq: Terminology of Performers in Kurdish Oral Literature

¹ Dr. Öğr. Üyesi, Bingöl Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Doğu Dilleri ve Edebiyatı, odelikaya@bingol.edu.tr, ORCID: [0000-0001-6505-5107](https://orcid.org/0000-0001-6505-5107).

Makale Gönderilme Tarihi / Article Submission Date: 13.07.2024

Makale Kabul Tarihi / Article Acceptance Date: 24.04.2025

Yazarlar dergide yayınlanan çalışmalarının telif hakkına sahiptirler ve çalışmalarını CC BY-NC 4.0 lisansı altında açık erişim olarak yayımlanmaktadır.

Authors own the copyright of their work published in the journal and their work is published as open access under the CC BY-NC 4.0 license.

Abstract

Recently, dengbêj(i), a prominent genre in Kurdish oral literature has become a frequently used fundamental concept in the academic discourse and explored from different perspectives. Among Kurds and academic circles, the word “dengbêj” (singer-poet) has become more visible than ever before, and has become an umbrella nomenclature for other oral narrative performers who previously do not categorize themselves as “dengbêj”. Especially from the 1960s onward, the nomenclature of dengbêj, which has become widespread in the realm of electronic culture, has also replaced some other regional names. Within the framework of this study, a close reading is conducted on the separate semantic implications of “deng” and “bêj” within the concept of “dengbêj”. The examination extends to explore the structural and semantic dimensions they convey concerning the performative dimension and content of the tradition. Additionally, the academic discourse surrounding the notion of “dengbêj”, denoting the art of being a dengbêj, and the use and regional differences in the nomenclature such as “şair”, “sazbend”, “kilamci”, “begzade” and “mitirb” were discussed. In this context, the study aims to shed light on the basic concepts of dengbêj tradition, one of the Kurdish oral narrative traditions, with data from the field and to open the multi-layered meanings attributed to the concept of dengbêj(i) to discussion from a different perspective.

Keywords: Dengbêj(i), Şair, Kilam, Kurdish, Oral Literature.

Kurte

Van salên dawî di edebiyata kurdî ya devkî de wekî cureyeke vegêranî ya pêşketî û pêşçav, dengbêj(i) bûye yek ji wan têgehên ku ji bo dînamîkên cihêreng ên vê hunera devkî tê ravekirin û şirovekirin. Di nav kurdan de û li derdorên akademîk, wekî peyveke etno-spesîfîk “dengbêj” ji her demê zêdetir xuya dibe û êdî bûye têgeheke şemsîye ji bo îcrakarên çanda devkî ku parek ji wan berê bi awayekî adetî xwe wekî “dengbêj” pênase nedikirin. Bi taybetî ji salên 1960î vir de, peyva “dengbêj” ku di nav çanda elektronîk de zêdetir belav bû û bi demê re cihê navên herêmî yên îcrakaran wergirt. Di çarçoveya vê xebatê de, pêkhateyên peyva dengbêj “deng”, “bêj” û “dengbêj+î”, ji aliyê wate û peyvsaziya xwe ve di çarçoveya nîqaşên dawî de tê şirovekirin. Herwiha ev xebat destnîşan dike ku bikaranîn û serdestiya peyva “dengbêj” wekî navekî standart li ser hemû (xwe)binavkirinan, cihêrengiya navên herêmî yên îcrakaran piştguh dike û ev jî dibe sebeb ku xwe-binavkirinên cihêreng ên çandî û wateyên wan ên herêmî di xebatên vê qadê de bên îhmalkirin. Di çarçoveya nîqaşên akademîk ên li ser têgeha dengbêj(i), ev xebat navên cihêreng ên îcrakarên edebiyata kurdî ya devkî yên wekî “şair”, “sazbend”, “aşiq”, “kilamci”, “begzade”, “mitirb” û hwd. şirove dike û berbelavî û taybetmendiyên wan ên herêmî nîqaş dike. Di vê pêwendê de, ev xebat bi nêrîneke navxweyî û bi daneyên ji qeydên deng ên îcrakaran û qeydên dirokî, term û têgehên sereke yên edebiyata devkî yên herêma Berfirat û Serhedê ronî dike û wateyên pir-tebeqeyî nîqaş dike ku li van terman bar bûne.

Peyvên Sereke: Dengbêj(i), Şair, Kilam, Kurdî, Edebiyata Devkî.

Extended Abstract

This article explores the nomenclature of Kurdish oral performers and examines the varying connotations associated with terms like *dengbêj*, *sazbend*, *aşiq*, *begzade*, and *mitirb*, with a particular focus on the Serhad and Berferat regions. Recently, *dengbêj*, or Kurdish oral-poets, has emerged as a frequently used fundamental concept in academic discourse and digital media. It has become an umbrella nomenclature for Kurdish oral narrative performers who previously did not identify themselves as *dengbêj*. The visibility and popularity of the term *dengbêj* have been notably on the rise since the 1960s, influenced significantly by the realm of electronic culture, which has, in turn, replaced some other regional names over time.

The study employs an emic approach, relying heavily on field research and oral feedback from performers and old tape records in which singer-poets from different regions talk about themselves and use different terms for self-identification. Analyzing both historical texts and contemporary practices, the research highlights the regional dynamics and evolution of terminology usage across different regions. With advancements in recording technology post-1960s, the dissemination of oral narratives from renowned singers in regions such as Serhad, Botan, Behdinan, Berfirat, and Afrin has facilitated inter-regional interaction of oral traditions, consequently broadening the usage of the *dengbêj* term. Literary works, notably those by Mehmet Uzun and pioneering research on *Dengbêj/Şair Evdal Zeynikê*, further influenced this evolution. The layered semantics of terms like *sazbend*, *mitirb*, *kilamcî*, and *şair* highlight how these terms reflect the socio-cultural and musical characteristics of different Kurdish regions, with the term *dengbêj* often overshadowing localized terms due to its widespread use and prestige.

Kurmanji exhibits rich varieties of terminologies for oral traditions, leading to inconsistencies in classification and nomenclature. Despite the widespread use of the term *şair* among Zazas, Kurmanj, and Sorans, it often receives limited attention in scholarly research. This term, with local variations like *şair* (*şayîr*, *şair*, *şaêr*), is commonly used across a vast geographical area, from Ardahan and Kars to Dersim and Koçgiri, Behdinan to Mardin and Urfa, and Afrin to Suleymaniya. However, field researchers frequently impose their own regional terminologies, obscuring the regional specificities and cultural richness embedded within these terms. Furthermore, the term *dengbêj* is often used generically for all performers, neglecting the diverse self-identifications and cultural nuances associated with different performance traditions. This article aims to provide a deeper understanding of the cultural diversity and self-identifications of Kurdish performers by critically examining the usage of the term *şair*, *sazbend* and *aşiq*. This external (etic) categorization overlooks the local (emic) self-definitions of performers and the nuanced semantics associated with each term. This terminology encapsulates a rich cultural heritage and regional diversity, with each term reflecting unique local attributes and practices. By documenting and acknowledging the multiplicity of regional terms, future research should strive to balance standardization with an

appreciation for regional specificity. This helps ensure that the varied and dynamic nature of Kurdish oral literature is comprehensively represented and understood.

The extensive nature of Kurdish oral literature and its varieties presents a challenge in creating a cohesive classification system. Despite similarities in the repertoire, regional dialects and performance dynamics influence style, instruments, and sound, reflecting remarkable diversity within Kurdish oral traditions. The emic perspective, focusing on local viewpoints and terminologies, underscores the importance of regional characteristics, improvisational abilities, and performance styles in shaping terminologies and preserving cultural heritage. By documenting the voices and terminologies of performers, especially those from regions like Serhad and Berfîrat, this study aims to foster a deeper appreciation of Kurdish oral traditions. In conclusion, while the term dengbêj has gained prominence and standardization across Kurdish regions, it is essential to recognize and preserve the multiplicity of regional terms to maintain the cultural mosaic of Kurdish oral traditions. Additionally, the findings suggest that future research in Kurdish oral literature should prioritize local terminology and performers' self-identification to better preserve the authentic cultural heritage of different regions.

Destpêk

Ev çend deh salên dawî, têgeha “dengbêj”ê di nav wan hemû navên îcrakarên edebiyata kurdî ya devkî de bûye yek ji navê herî ‘eyan û pêşçav. Wekî navekî etno-spesîfîk û xwerû bi kurdî “dengbêj” di nav xebatên li ser dengbêjiyê de pir caran tê îşaretkirin û wekî term û têgeheke sereke ya vê qadê tê şîrovekirin û şixulandin. Piştî ku ev nav bi rengekî erênî zêde navdar û berbelav bû, li herêmên cuda hin îcrakarên edebiyata kurmançî ya devkî ku bi awayekî tarîxî û adetî xwe wekî dengbêj bi nav nedikirin, êdî “bûne” dengbêj an jî ji bo raya giştî xwe û îcrakariya xwe ya hunerî wisa pênase kirin/dikin. Meriv dikare destnîşan bike ku peyva “dengbêj”ê ji aliyê wate û temsîla xwe ya heyî ve jî berfirehtir bû û li hemberî komê peyvên din ên wekî şair (şair, şayêr, şayîr, şayer û hwd.) aşiq, sazband, kilamçî û hwd. rehendên nû yên wateyî bi dest xist ku di çanda kurdî ya devkî de yan hinkufê wê bûn yan jî bi wateyên xwe yên herêmî ve carinan beramberî wê dihatin şixulandin. Li milekî din, piştî salên 1960î werar û dînamîkên nû peyda bûn di çanda devkî de ku di vê maweyê de bi teknolojiya tomarkirina deng kilamên bi sedan dengbêjên navdar ên ji Serhed, Botan, Behdînan, Berfîrat û bi taybetî jî yên ji Efrînê ber bi herêmên nû belav bûn û danûstandinên çanda dijîtal yên di navbera herêmên cuda yên “kilambêjî”² de xurt bûn. Herçiqas wê hingê li Tirkiyeyê çanda kilambêjiyê di bin guvaşên polîtîkayên dewletê de û qismen jî ji ber tesîra tevgerên siyasî yên kurdî de dihate tepeserkirin û lawazkirin, li Suriye, Iraq û Îranê rewşeke nispeten azad hebû di secilandina destan û kilamên kurmançî de. Li Tirkiyeyê ji aliyê aktorên siyasî yên kurdî ve çanda dengbêjiyê bi pergala feodalîteyê re dihate têkildarkirin ku vê yekê tesîreke neyînî li ser pêşketina vê çandê dikir (bnr. Scalbert-Yücel, 2009; Hamelink & Barış, 2014). Piştî ku qedexa û guvaşên li ser zimanê kurdî rabûn û li hawîrdorên çandî yên elektronîk de bi serbestî sewta kilambêjan bilind bû û derdorên siyasî yên kurdî jî bere bere derheqê dengbêjiyê de nêrîna neyînî terikandin, bi piştgiriya şaredariyan bi sernavê “dengbêj”ê mal û mekanên nû yên ne-adetî hatin saz kirin ku Scalbert-Yücel (2009) vê kirara nûpeydabûyî wekî “îcada nerîta dengbêjiyê” bi nav dike.

Helbet di babeta navdarbûna navê “dengbêj”ê de divê meriv rola berhemên nivîskî jî ji bîr neke ji ber ku dengbêj(î) di berhemên edebiyata nivîskî de (çi bi tirkî çi jî bi kurdî) gelek caran bilind hate nixxandin û wekî hunereke kurdî a resen hate pêşkêşkirin. Di hin romanên Mehmed Uzun de bi taybetî di *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* û *Hawara Dicleyê* de (bnr. Bocheńska, 2022) û di *Dengbêjlerim* de ev nav gelekî derket pêş çavan bo xwînerên kurdî û tirkî yên li

2 Di vê xebatê de, ji ber ku babet bi xwe nav û binavkirin e, me bi awayekî bi ihtiyat peyva kilambêj(î) û kilamgotinê di dewsa navê giştî yê îcrakariyên kurdî de bi kar anî da ku navekî li ser îcrakarekî ji herêmeke din neyê sepanandin. Wate, me nexwest em kesekî ku ji xwe re dibêje sazband, wekî dengbêj binavînin û di vê xebatê de wisa îfade bikin. Herwiha divê meriv destnîşan bike ku peyva “kilam”ê xwediyê berbelavî û hevpariyeke mezin e di nav civaka kurdan de û ji aliyê wateyê ve jî carcar di dewsa destanan de jî tê xebitandin ku ev yek wateya îcrakariya herdu cureyan (destan-kilam) bi yek derbê de dikare pêşkêş bike.

Tirkiyeyê.³ Herwiha, Yaşar Kemal jî bi başî behsa dengbêjan kir di berhemên xwe de ku ji aliyê girseyeke mezin ve dihatin xwendin. Dîsa xebata Ahmed Aras a pêşeng a bi navê *Şairê Kurda yê Efsanevî Evdalê Zeynikê* (2018 [1996]) li derdora edebiyata kurdî bi navê Evdalê Zeynikê bal kişand ser şairî û dengbêjiyê.⁴ Bi rêya teknolojiyê (kasêt, radyo) bi tevî repertuarên îcrakaran navên wan ên herêmî jî bo deverên nû hatin veguhastin û li wan deran jî hatin bikaranîn. Bo nimûne, bi saya serê Radyoya Rewanê bi salan dengbêj û repertuara wan li gelek deverên nû hate bihîstin (Hamelink, 2016: 43). Van hokarên navborî kirin ku peyva dengbêjiyê navdar bibe û bi demê re jî standart bibe. Piştî wextan zehmet bû ku meriv wan herêman pê derxe ku bi awayekî adetî û dîrokî bi têgeha dengbêjiyê an jî bi têgeheke din a herêmî ve hunera kilamgotina xwe bi nav dikirin. Jixwe kurmançî bi tevî devokên xwe jî bo diyardeyekê xwedî çend cure binavkirinan e û cihêrengiya navan jî bo îcrakariyên devkî yên hunerî jî wekhev nîne. Lêbelê bi awayekî giştî li ser formên vegêranên nerîtî problemên binavkirin û senifandinê hene (bnr. Bascom, 1965; Kaplan, 2020: 134; Çobanoğlu, 2023: 18; Reichl, 2022: 24-26; Allison, 2001: 60-85; Keskin, 2019: 151-152). Li rû-dinyayê di nav hemû çandên devkî de nelihevî û nakokî li ser termînolojî û senifandina cureyên devkî û navandina wan peyda dibe, lê xisûsen di kurdî de ji ber ne-standarbûna zimên, tesîra zimanên cînar, pir-şêwezarî û pirdevokî di binavkirina cureyên vegêranî yên sereke de tevlihevî û pirnavîyeke berçav xuya dike (bo zêdetir malûmatên li ser pirnaviya cureyên vegêranî yên edebiyata devkî, bnr. Subaşı, 2022). Lêbelê, di piraniya xebatên çanda kurdî ya devkî de cihêrengiya termînolojiya îcrakaran tê paşguhkirin. Gelek caran bi awayekî ji derve ve (etic) hin nav û nîşanên ji herêma vekolîner an jî yên giştî û populer li ser lêkolînên qadê tên sepandin, bi vî rengî, navên cihê cihê ku parek ji wan li ser rewş û statuya îcrakarî û normên civakî nîşan didin, nedîtbar dibin.

Peyva “dengbêj”ê hem ji ber pêkhateya xwe ya “deng” hem jî ji ber paşgira (an jî koka dema niha ya peyva “gotin”ê) “-bêj”ê ve îşaretê bi wate û rehendên cihê cihê yên li ser xisûsiyetên xwe dide der. Gelo çendî durist e, meriv peyva “dengbêj”ê di dewsa hemû wan navên îcrakarên din de bi kar bîne ku bi rengêkî adetî bi peyva “dengbêj”ê re ne nêznas in? Gelo dema meriv bi nêrîneke navxweyî (*emic approach*) li qadê dinêre û vegêran û axaftinên îcrakaran bi xwe esas digire ji bo lêkolînan wê hingê wêneyekî çawa dertê pêşiya meriv? Gelo îcrakarên çanda kurdî ya devkî bi taybetî jî kilambêj û destanbêjên Serhed û Berfiratê xwe bi kîjan navan ve terîf dikî(ri)n? Derveyî nîrxandin û binavkirinên ku em li ser wan disepînin, ên wekî “hunermend”, “hunermendên gelêrî”, “hozan”, an jî ji bo hin herêman “dengbêj”, wan çawa xwe bi nav dikir. Di vê xebatê de, em dixwazin bikolin/bixwînin bê ka peyva “dengbêj(î)”yê û milkê wê yê peyvسازی û watenasiyê çi êşkere dike ji bo me û çi têgeh hene ku di dewsa wê de ji bo îcrakarên vegêranên devkî yên herêmên cuda tên îqamekirin. Di vê behsê de

³ Kitabên Mehmed Uzun jî ber ku zû dihatin wergerandin gelek kesan ew bi tirkî jî dixwendin.

⁴ Herçiqas Aras di sernavê kitaba xwe de bi awayekî rast Evdalê Zeynikê wekî “şair” bi nav kiribe jî, di nav civata kurdî de Evdal zêdetir wekî “dengbêj” derkete pêş.

Reichl di xebata xwe ya li ser çanda destanbêjiyê ya li Asyaya Navîn de, balê dikişîne ser navên îcrakaran û destnîşan dike ku “her nav çend taybetmendiyên spesîfîk bi xwe re nîşan dide ku ev binavkirin cure û cihêrengiya stranbêj ji cureyên din ên stranbêjan vavêr dike. Carcar navên cihêreng ji bo heman cureya stranbêj-vegêr tê bikaranîn; carcar cureyên stranbêj (*singer-types*) ên cuda di nav heman dorhêla çandî de pêş dikevin” (Reichl, 2022: 24).

Di vê çarçoveyê de li dor peyvên wekî “dengbêj” û “dengbêj+î”, “sazbend”, “mitirb”, “kilamcî”, “gewende” û “şair” nîqaş û lîteratura têkildar tê pêşkêşkirin û wateyên pir-tebeqeyî tîn destnîşankirin ên ku li herêmên çandî yên cuda li navên îcrakaran hatine barkirin. Di vê peywendê de, bi nêrîneke xwecihî û bi nimûneyên deqî û dengî termînolojiya binavkirin an jî xwenavkirina îcrakarên çanda devkî tê nîqaşkirin ku ji herêmekî heta herêmeke din li gorî faktorên wekî statuya civakî, muzîkalîte/enstruman, împrovîsasyon (bi xamî gotin), cure, şêwezar û hwd. şêkil û wateyên cihêreng (wer)digire. Ji ber ku ne mimkin e ku meriv bîne çanda kurdî ya devkî û termînolojiya wê ya berfireh, tevlihev û li gorî herêman bi wate û fonksiyona xwe ve guherbar di nav xebateke kurt de bi cih bike, di vê xebatê de herçiqas ji herêmên din jî nimûne hatibin wergirtin, ber û bal zêdetir li ser Serhed û Berfiratê ye.⁵ Herwiha ji ber ku di piraniya xebatên weşandî de, di dewsa hemû kesan de peyva “dengbêj”ê tê bikaranîn, me qismek nimûneyên xwe rasterast ji dev û dengê kilambêj/îcrakar bi xwe hilda da ku meriv ji perspektîfa herêmî û dînamîkên wê yên guherbar baştir haydar bibe.

Cihêrengiya Navên Îcrakaran

Di edebiyata devkî de ligel cihêrengiya navên cureyên vegêranî, navên îcrakar û vegêran jî gelek in. Dema ku meriv navên di şêwezarên kurdî de jî hesab dike ku di nav xwe de ew jî xwedî cihêrengiyekê ne, wê hingê meriv dibîne ku carcar cureyeke vegêranî, bo nimûne stranên têkildarî babetekê li herêmên cuda û hetta di nav eşîrên cuda de dibin xwedî wate û bikaranînen herêmî. Ev rewşa adetî ya cihêrengiya nava di çanda kurdî ya devkî de carna dibe sebeb ku meriv bi rihetî nikaribe senifandinekê çêbike di nav cureyên edebiyata devkî de. Bo nimûne, kilameke naskirî ya ku di nav kurmancî de berbelav e; Filîtê Quto an jî Hesênê Mala Mûsa li herêmên cuda ji aliyê wan îcrakaran ve tê vegêran ku xwe wekî dengbêj, kilamcî, sazband, şair, meqambêj, selîqebêj û hwd. pênase dikin. Repertuara kesên ku ji xwe re dibêjin dengbêj û miqambêj diqewime ku ne dûrî hevdu bin, lê taybetmendî û dînamîkên devok û herêmê tesîra xwe heye li ser awa, enstruman û sewta wan. Ev yek jî tiştekî asayî ye. Cihêrengiya navên cure/çeşnên edebiyata devkî gelek in (beyt, zêmar, çîrok û hwd.) û bi rêya peyvsaziya kurmancî ji wan navên cureyan pareke mezin bi rihetî dikare paşgira “-bêj”ê werbigire û navê îcrakar saz bike: beytbêj, zêmarbêj, çîrokbêj. Di vê xalê de divê meriv ji bîr neke ku di soranî de jî ev qertaf çalak e û peyvên wekî beytbêj,

⁵ Ev herdu herêm bi xwe jî bi temamî xwediyê termînolojiyeke hevpar nînin, têgeh carcar li gorî eşîr û bawerî û normên civakî diguherin. Li Rihayê peyvên wekî axa, gewende, dûman û mitirb derkevin pêş jî li Efrînê kirîf û qurbet dertê pêş û wateya neyînî ya mitirb kêmîr dibe.

heyranbêj, bendbêj li gelek deverên soran jî tên bikaranîn. Navên îcrakarên çanda kurdî ya devkî li gorî taybetmendiyên herêmî, awayê îcrakarî û sazkarîyê, statuya civakî û şiyarweriya împrovîzasyonê û cureya vegêranî, cihêrengiyeke berçav nîşan didin: şair, dengbêj, beytbêj, çîrokbêj, dewrêş, (i)stranbêj, qewlikbêj (qewwal), neqqal, qesîdebêj, kilambêj, destanbêj, heyranbêj, goranîbêj, qaîdebêj, zêmarbêj, qewlbêj, lawikbêj, meqambêj⁶, ‘ulimbêj û zarbêj, serhatîbêj, bendbêj,⁷ selîqebêj û berîtebêj, sazband, aşiq, kilamcî, mitîrb, gewende, kirîf, qurbet, begzade, dûman/doman, sazkar, sî(y)awçemanewaç⁸, xoreçir⁹, pîr, dede, nuktecî, hozan¹⁰... Qismek ji wan peyvên carcar li hin deveran jî bo îcrakarîya dengbêjiyê jî tên bikaranîn.¹¹

Lêkolînerên qadê û kesên ku bi berhevkariyê re mijûl dibin, termînolojiyên herêmên xwe di dewsa term û têgehên herêmî de bi kar tînin û zêde guh nadin nav û xwe-pênasekirinên îcrakaran. Bo nimûne, Celîlê Celîl di berhevkariya xwe ya di nav kurdên Suriyeyê de, termînolojiya Serhedê tercîh dike di dêleva ya herêmî de (Mürer & Çakır, 2022: 10). Ji ber ku xebatên bi vî cureyê jî zêde ne, term û têgehên herêma Serhedê yên wekî dengbêj û kilam berawird ligel herêmên din berçavtir bûne. Ev helwestên yekkirina termînolojiyê aliyekî wêneyekî yek-rengî (*monochromatic*) yê muzîk û çanda kurdî ya devkî nîşan bide jî, aliyê din jî hevpariyên nav-herêmî nîşanî kesine biyanî û nenasê vê çandê dide (Mürer & Çakır, 2022: 10). Yekrengiya termînolojîk di çanda devkî de ku tê de peyva “dengbêj”ê yan jî bi giştî termînolojiya Serhedê (helbet pareke mezin li deverên din jî) serdestiyê ji komêk peyvên din re dike û dibe awayê standart ê çanda kurdî ya devkî diqewime ku ji ber van sedeman be: rêjeya bilind a hejmara dengbêjên Serhedê, hînterlenda berfireh a vî herêmê û tesîra wê li dorhêla wê, ji

⁶ Meqam an jî miqam wekî navekî hinkufê “kilam”ê vêga li devera Hekarî, Behdînan û di nav soranan de tê bikaranîn.

⁷ Ji bo wan cure îcrakariyên devkî tê gotin ku tê de du kes tên cem hevdu û bi îrticalî an jî carcar ji kaxizên nivîskî bendan davêjin ber hevdu, bi taybetî li Hewlêr û Mukriyan berbelav e. Bo nimûne, ji bo bendbêjiya Smaîlê Serdeştî û Faxîr Herîrî, bnr. Omer Yaxî (2011).

⁸ Li Hewraman tê bikaranîn.

⁹ Keskin (2019: 152) dibêje ev peyv di nav kurdên li Îranê de tê xebitandin.

¹⁰ Di nav bikaranînan adetî de em rastî vî peyvê nehatin ku ji aliyê dengbêjên berê ve hatibe gotin. Di nav nîfşên nû de gelek kes hene ku vî navî jî bo xwe dişixulînin. Herwiha di nav kurdên Iraq û Îranê de jî ev peyv xuya dike ku carcar wekî hozanvan jî tê bikaranîn ji bo helbestvanan. Bo nîqaşeke dîrokî û dirêj li ser peyva “gosan” zimanê partî û rolên gosanan ên dîrokî, bnr. Boyce (1957).

¹¹ Divê meriv ji bîr neke ku hin dengbêj di heman demê de beytbêj, çîrokbêj, qesîdebêj, stranbêj an jî qewlikbêj û hwd. bûn. Bo nimûne, tê neqilîkirin ku Dengbêj Reso, serê sibehan piştî nimêja sibê qesîde jî digotin (Kaniya dengbeja, 2022). Kurê dengbêjê navdar Ûsivê Mihacir, Derwêş Qado li ser ziyaretan gelek caran qesîde jî xwendine (Ertekin, 2019: 624). Ûsivê Mihacir ku jî Serhedê koçber dibin û li Farqînê bi cih û war dibin li vî herêmê jî dengbêjên binavûdeng re hostatiyê dike û malbata wî jî bi çanda xurt a qesîdexwendinê tê nasîn (Hevpeyvîn ligel Hecî Şerîfê kurê Derwêş Qado, 2021). Çawa ku tê dîtin ji aliyê îcrakarên cureyên wekî kilam û qesîdeyê ve meriv dibîne ku ew kes carcar di herdu cureyan de jî pêşketî ne û wan bi hostatî pêşkêşî cimaeta guhdar dikin. Îcar, li ser vî rewşa du-leteyî ya peyvê vekoleran wateyên cihêreng li peyvê bar kirine.

aliyê etîmolojîk ve “resenî” û kurdîbûna peyva “dengbêj”¹²ê, binavûdengbûn û tesîra Evdalê Zeynikê li vê herêmê û tevkarî û balkişandina rewşenbîran li ser vê çandê.

Deng+bêj+î: Wate, Serdestî û Berbelaviya Cografîk

Dengbêj, wekî term û têgeheke çanda devkî herî kêr ev du sedsal e li seranserê Serhedê¹³, herwiha li derveyî sînorên Tirkîyeyê, Makû, Êrmiye, û di nav kurmancên Ermenistanê û li bajarên wekî Çewlîg, Diyarbekir, Batman û Mêrdînê û dorhêla wan kêr-zêde tê bikaranîn. Îrora ev peyv ji sînorên xwe yê xwemalî derketiye û êdî ji herêma Berfiratê bigire heta Şengal, Duhok û Zaxoyê jî hem ji aliyê îcrakaran ve tê bikaranîn hem jî di bernameyên dijîtal de wekî navekî sereke dertê pêş. Ne mimkin e ku sercem herêmên navborî ev peyv qet nebihîstibin an jî bi kêrî be jî bi kar neanîbin, lêbelê ev peyv di şixulandinên wan ên adetî de zêde dernakevin pêş wekî ku li Serhedê li pêş e. Herwiha meriv dikare bibêje ku ev peyv di zazakî de jî ji bo îcrakariyên kilamgotinê yê bi kurmancî bi rengekî çalak tê bikaranîn. Hetta hin kesên ku kilamên xwe bi kurmancî û zazakî dibêjin bo xwe vî navî tercîh dikin, bo nimûne em dikarin navê Dengbêj Cemalê Dursî bidin (Çîçek, 2024). Ev peyv bi rengekî çalak ji aliyê qismek kurmanc û zazayan (bi taybetî li Çewlîg, Diyarbekir û Gimgimê) ve jî tê bikaranîn. Bikaranîna wê ya ji aliyê zazayan ve jî tiştekî ne seyr e ji ber ku di nav zazayan de, bi taybetî jî li Çewlîg, Muş û Diyarbekirê hem guhdariya kilamgotina kurmancî hem jî îcrakariya wê melûm e (bo dengbêjên li Çewlîgê yê kurmanc û zaza, bnr. Karasu û yê din., 2007). Navên naskirî hene di nav dengbêjan de ku zaza ne, van dengbêjên zaza di pêşketina vê çandê de roleke girîng gêrane. Bo nimûne, yek ji wan dengbêjên navdar ê Diyarbekirê Hesenê Şêx Xalid (1933-2002) e ku zazayê Hênêyê ye û li Diyarbekir û Çewlîgê bûye hosteyê birrek dengbêjan (bnr. Meretowar, 2017: 17; Delikaya, 2023: 382).

Ji ber ku ev peyva “dengbêj”ê di tu zimanên din ên cîhanê de¹⁴ nayê dîtin û tenê ji aliyê kurdan (bi taybetî kurmancî) ve tê bikaranîn, di lêkolînên bi zimanên din de jî derbirînen derheq pênasekirina vê çandê de bi peyva “dengbêj”ê bi xwe ve tê destnîşankirin. Wate, ev hunera kurmancî di nav xebatên çanda cihana devkî de bi navê xwe yê taybet berbelav dibe û derbasî zimanên din dibe. Îrora ji ber hin xusûsiyetên xwe yê xwemalî dengbêjî di xebatên li ser vê çandê de ne wekî *bard*, *minstrel*, *singer-poet* an jî *troubadour* lê her bi navê xwe tê îşaretkirin. Di xebatên têkildarî vê çandê yê di zimanê tirkî de êdî “dengbêj” qewîn cihê xwe girtiye (bo nimûne bnr. Aras, 2018; Parlîltî, 2006;

¹² Hin peyvên ku ji mêj ve di nav çanda kurdî ya devkî de cih girtine, ji aliye derdorên kurdî ve ji ber ku kokên wan ji erebî an jî ji zimanekî din in, nayên tercîhkirin an jî tên piştguhkirin (Hevpeyvîn ligel Pervîz Cîhanî, 01/05/2024).

¹³ Meriv dikare bajarên wekî Erzurûm, Qers, Îdir, Erdexan, Agirî, Mûş û pareke Wan û Bedlîsê di nav vê herêmê de bifikire.

¹⁴ Hin peyvên îcrakarên edebiyata devkî hene ku di navbera çand û zimanên cuda de bi heman wate û temsîlê tên bikaranîn an jî zimanên cînar wê peyvê deyn dikin, bo nimûne peyvên wekî şair û aşiq di zimanên din de jî tên dîtin.

Uzun, 2006; Kardaş, 2017). Di zimanên ewropî de ji 2000î vir de êdî ev peyv berbelav bûye û di hemû xebatan de wekî xwe tê bikaranîn (bnr. Ferdeghini, 2022; Darati, 2023). Bi rengekî giştî, xebatên kurdî û yên zimanên biyanî jî zêdetir peyva “dengbêj”ê derdixin pêş û serdestî û standarda peyva “dengbêj”ê xurttir û berbelavtir dikin, beramberî vê, pirraniya van xebatan bikaranînên herêmî û wateyên ku digirin li ser xwe bi temamî nebe jî paşguh dikin.

Ji aliyê xwe yê wateyî û peyvsaziyî ve jî wateyên cihêreng li vê peyva “dengbêj”ê hatine barkirin. Dema ku meriv li dengbêj(î)yê dinêre, meriv dibîne ku para pêşîn jê “deng” e ku navdêr e, para din jî gireya “-bêj”ê ye ku hatiye ser deng. Di vir de “-bêj” gireyek e ku ji reha dema niha ya lêkera “gotin”ê ye. Herwiha lêkera “gotin”ê di raweya fermanî de jî bi forma “bêj”ê tê kişandin, bo nimûne; (bi)bêje (yekjimar-kesê duyem) (bi)bêjin (pirjimar-kesê duyem). Dema ku em li peyva “deng-bêj-î”yê dimeyzînin, em dibînin ku ji van yekeyan pêk hatiye:

deng: Navdêr e ku wateya wê ya ferhengî wiha ye: Sewt, awaz, seda, pêjn, gazî, bang, hawar, tiştê dikare bête bihîstin.

-bêj: Koka dema niha ya lêkera “gotin”ê ye ku bi demê re veguheriyê paşgîrekê û peyvîne din jî hene ku bi vê paşgîrê tên sazîkirin.

-î: Paşgîreke kurmancî ye ku hem di morfolojiya kêşanî de hem jî di morfolojiya dariştinî de li kar e. Li vir, bi fonksiyona xwe ya dariştinê rabûye ku ji peyvekê (dengbêj) peyveke din (dengbêjî) dariştiye (bnr. Akgül, 2024). “Dengbêjî” navê vî karê hunerî yê kilamgotinê ye ku dengbêj îcra dike.

Eger em li ser peyvsaziyê re li “deng+bêj”ê binêrin, em dibînin ku bi paşgîra “-bêj”ê hin navên din ên îcrakariyên nerîta devkî jî saz bûne û ev paşgîr bûye parçeyê peyvsaziya kurdî ku pê terîf û wateyên têkildarî derbirîn û sewtê tên îfadekirin. Çawa ku melûm e, zimanê kurdî xwediyê nerîteke kevn a devkî û “deng”î ye li gel nerîteke nivîskî û kitabî ya ne zêde qedîm. Herçiqas pêwendîdariyê wan a dewamdar hebe jî di çanda kurdî de devkîbûn jî nivîskîbûnê serdesttir e û vê rastiyê bi sedan salan berdewam kiriye heta du sedsalên dawî ku çanda kurdî ya nivîskî jî êdî xwe gihandiyê asteke dilxwaz. Di nav kurdan de amraza herî giring a xeberdan, derbirîn û danûstandina di navbera merivan de û parastina mîrasa çandî bi saya serê “deng”î pêk tê; bi rêya deng û gotinê, zanîn û nerîtên civakî yên curbicur derbasî nîfşên siberojê dibin. Dengbêj ji ber “deng”ê xwe tê pesandin û hetta hin ji wan jî ber dengê xwe tên binavkirin.¹⁵ Lewra “deng” ber û balê dikişîne ser sewta muzîkal û kapasîteya kilamgotinê (Reichl, 2022: 68).

¹⁵ Dengbêj Sîdîqê Qarlıova di nav xelkê de wekî Sîdîqê Dudeng jî tê nasîn. Dîsa dengbêj Mistefayê Çiftborî ji ber bilindbûna dengê xwe wekî Çiftborî hatiye binavkirin. Herwiha ji bo serpêhatiyêke têkildarî bilindbûna dengê Dengbêj Şerîfê Çîngo, bnr. Gültekin (2013: 21).

Cihê dilxweşiyê ye ku êdî cureyê herî navdar û berçav a kurmançî angoyê kilamgotina bi kurmançî dibe mijara xebatên akademîk, biyografîk, antolojî û berhevkarîyê. Bi awayekî isûlî di xebatên li ser dengbêjiyê de terfî û pênasayên derheq peyva dengbêj(i) tî pêşkêşkirin û di wan xebatan de hewldanên ku vê çandê bi awayekî zêde dixin nav kirasê romantîzmê û otantîkbûnê dertên pêş. Hewldanên wihareng ku xeml û xêza vegotinê bi çanda kurdî ya devkî yekane dibînin û wê romantîze dikin dibin sebeb ku em bi hestiyarî tevbigerin bêtî ku li ser wate û rehendên binavkirinê ve çandê bifikirin. Derheq vê babetê de Alan Dibêje (2015: 9) “ferhenga me bi belaxatê tije ye” û destnîşan dike ku di behsa li ser dengbêjiyê de em gelek peyvên wekî “lehengê çandê qedîm”, “avakarê hişkî civakî”, “hosteyê peyvê”, “hêza kelamê”, “dengê çanda bav û kalan” li pey hev rêz dikin. Kînas (2020) jî di vê mijarê de îdia dike ku nêrînên ku bi hûrbînî li peyvê dinêrin jî zû de ye cihê xwe hêlaye jî wan îfadeyên romantîk re ku dibêjin dengbêj ew kes e ku “deng dibêje” an jî ew kes e ku “kelamê dixê kilam”. Meriv dikare “deng” a dengbêj wekî “deng” a di cotepeyva “deng û behs”ê de binirxîne ku bi vî rengî ew tê wateya behsbêj an jî ew kesê ku riwayet/vegêranê neqil dike (bnr. Kînas, 2020). Li ser peyva “dengbêj”ê, Güneş û Şahin (2019a: 15-16) destnîşan dikin ku di têgeha “dengbêj”ê de çend wateyên “dengi” hene û wiha berdewam dikin:

Wateya yekemîn, di çarçoveya meqam, sewt û awazê dengbêjiyê de melodî, lorandin, xulxulandin, û jenandin e. Wateya duyemîn, bûyerên ku qewimîne û di nav kurdan de deng dane û jê hatine qîsedanê. Ev bûyer (eşq, şer, û mijarên wekî din) berbelav bûye, li gelek deveran hatiye bihîstin [...] “Dengê” dengbêj, dengdayîna bûyerê, deng û dengdayînê lehengên bûyerê naveroka peyva dengê pêk hatiye.

Bêj jî gotin û vegotin e. Bêj peyva bijarte ye. Bêj peyva kemilî û kamilî ye. Bêj hêz û bedewbûna hunera dengbêj e. Bêj honaka kilamê ye, vegotin û sêwirandina naveroka kilamê ye. Wêjeya kilamê bêjê diherike û dikemile. Bêj helbest e. Lewma jî dengbêj di hêlekî de helbestvan e. Gelek kilaman bi xwe sêwirandine, afirandine. Her kilam helbestek e. Her dengbêjê ku kilam sêwirandine helbestvan e.

Çawa ku ji pênasakirina Güneş û Şahin (2019a) diyar e ku ew cîciyan bi îfadeyên wekî “bêj peyva kemilî û kamilî” û “hêz û bedewbûna hunera dengbêj” dikevin nav romantîzmê. Lêbelê ew peyva “deng”ê di pêwenda meqam, sewt û awazê de wekî “melodî, lorandin, xulxulandin, û jenandin”ê dinirxînin û wateya wê ya duyem jî li ser wan bûyeran re şirove dikin ku “di nav kurdan de deng dane û jê hatine qîsedanê”. Herdu parçeyên peyvê “deng” û “bêj” bûne mixatabê şiroveyên cihêreng. Hin şirove wateya qewam û çîrokê didin peyva “deng”ê û “bêj”ê jî aliyê hunera performansê derdixin pêş: Deng, îşaretê bi wê deqa devkî ya hunerî dike ku bi bêjê ve dibe meqamê ku tê vegêrandin. Bi vî awayî, îcrakirina performansê dengbêj a vegêranê hunerî li ser du tiştên esasî ava dibe: yek jê çîrok/qewam (deng) û ya duyem performansê wê ya hunerî ya vegêranê (bêj) tê îşaretkirin (Delikaya & Ertekin, 2021: 15). “Bêj” di çanda dengbêjiyê de dikare wan awaz, sewt û meqamên cihêreng terfî bike ku ji dengbêjekî heta yekî din dikeve nav guherîneke berdewam. Eger meriv tenê li wateya berdest a peyva dengbêj bifikire, wê hingê meriv dê bibêje ku dengbêj ew kes e ku *deng dibêje*. Lêbelê, ev

terîf ji aliyê wateyê ve hin qelsiyên nîşan dide. Yanê deng-gotin çawa meriv dixe dengbêj! Dema meriv peyvên wekî stran-bêj, çîrok-bêj, beyt-bêj dinêre, meriv dibîne ku tiştê ku “-bêj” tê li ser di gewherê de vegêran an jî qewameke ku tê neqilkirin an jî derbirîn. Li vir deng ew tişt e ku dengbêj wê vedigêre û destedewrî nifşên nû dike. Herwiha deng, îşaretê bi sewta dengbêj jî dike.

Dema meriv li lêkolîneke ser qeydên nivîskî yên ewil dinêre, meriv dibîne ku Mela Mehmûdê Bazîdî yek ji wan kesê ewil e ku derheqê cîhêrengî û awayê îcrakariya vê çanda kilamgotinê û dawetên kurdan de melûmatên berfireh dide û behsa dengbêj, sazband û begzadeyan dike. Mela Mehmûd jî bo kurdan dibêje ku “dengbêjê wan heyin, bêrîtan dibêjin” (Çelik, 2015: 160; Dost, 2010: 68-69). Ev behs li ser statû, kategorî û enstrumanên çanda dawetan de agahiyên giring dide û di heman demê de behseke giring e ji bo dîroka vê peyvê. Nebûna qeydên dîrokî (diqewime ku qeydên kevntir jî hebin), nayê wê wateyê ku ev peyv çend sedsalên dawî ketiye zimanê kurdî û ev wate û fonksiyon wergirtiye. Eger meriv rasterast ji îcrakarên vê hunera devkî nimûneyan bide ku piraniya wan bi derengî hatine nivîsandin, meriv dibîne ku Evdalê Zeynikê, şair û dengbêjê navdar ê Serhedê di kilameke xwe de ku ji nav kurdên Ermenistanê hatiye berhevkirin, navê dengbêjê ligel çend îcrakarên din dide û wiha dibêje:

E'vdal go: -Gulê, ez E'vdalim, ez **dengbêjim**,

Ezê çoka xwe didime r'ex çoka **aşiq û sazbanda**, dîwanê bega da divêjim,

Ezê k'erba Gulê, îsal him ker'im, him gêjim (Celîl & Celîl, 2016 [1978]: 428).

Meriv ji vê benda kilamê fam dike ku aşiq û sazband wekî îcrakarên cuda di nav çanda li Serhedê de jî her hebûne. Li gelek deveran aşiq herî zêde bi peyva sazbandê re tê şixulandin, ji ber ku kesê aşiq pirî caran bi xwe sazbandekî amûrjen e an jî bi sazbandan re dibêje. Eger em bo peyva “aşiq”ê xeber din ku li herêma Berfiratê tê bikaranîn, em dikarin bibêjin ku ev nav di nav gelên cînar de tê dîtin û hetta di ziman û çandên îranî de jî heye. Ji aliyê navê xwe ve peyva “dengbêj”ê tenê ji bo nerîta kurdî ya kilamgotinê tê bikaranîn û hetta eger meriv îcrakariya zazayan a bi kurmançî bide alî tenê di nav civaka kurmançî de tê bikaranîn. Jixwe çanda dengbêjiyê jî tenê di nav civaka kurmançî de peyda dibe (Çaçan, 2013: 50-54)¹⁶ û wiha tê dîtin ku cure û îcrakarên din ên di nav kurmancan de ji vê çandê yan bi temamî yan jî bi hin xisûsiyetên xwe ve cudahiyê nîşan dide (ji bo hin cudahiyên îcrakariya bi zazakî ya li Dêrsimê, bnr. Greve, 2018). Ji bilî vê, ev peyv wekî têgeheke sîwan û populer van salên dawî temsîliya hin deveran jî

¹⁶ Li ser vê meseleyê, divê meriv çanda kilambêjî û sazbandiyê ya ku bi sedan salan di nav civakên ne misilman (ermenî û suryanî) de jî bir neke. Ji ber ku di sedsalên borî de li Kurdistanê serdestiya kurdî wekî zimanê danûstandin û bazarê di nav milletên ne misilman de diyardeyeke berçav bû û ji ber vê çendê materyalên fêrbûnê û metnên dînî yên ewil bi alfabe ya ermenî û bi zimanê kurdî hatine amadekirin da ku xitabî wan ermenîyan bike ku zimanê xwe yê dayîkê nizanin (bnr. Sayım & Ertekin, 2024; Dîkranyan, 2024; Arslan, 2025: 181-208). Dîsa heta nîka em dibînin ku zaf destan û kilamên kurmançî ji zarê dengbêj, aşiq û şairên ermenî û suryanî hatine komkirin (bo nimûne, bnr. Celîl & Celîl, 2014a; 2014b, 2016; Aslan & İsmail, 2025).

dike ku îcrakarên li van deveran bi rengekî dîrokî xwe wisa newesifandine an jî ji aliyê şêwe û naveroka xwe ve vegêranên wan qîsman ji yên dengbêjan cuda dibin. Lê gelek navên wekî sazband, aşiq, şair, kilamcî, dûman, gewende, begzade, poşe, mitrib/mitirb û hwd. jî hene dema meriv naveroka vegêranên wan dinêre meriv dibîne ku ew jî kilam û destanan îcra dikin û di naverok û repertuara wan de hevparî jî xuya dibe digel cudahiyan lê bi binavkirinên herêmî ve xwe terîf dikin.

Peyva din a ku bi vê babetê re têkildar peyva “dengbêj+î”yê ye. Ev peyv ku navê vî karê hunerî yê kilamgotinê destnîşan dike û peyveke razber e. Di derdorên akademîk de nîqaş li dor vê peyvê jî çêbûne. Hin vekolîner îdia dikin ku ev peyveke nû ye û van çend deh salên dawî ketiye nav zimanê kurdî yan jî di nav dengbêjan de teze cihê xwe digire (ji bo nîqaşên li ser vê peyvê û nûbûna wê bnr. Schäfers, 2015; Scalbert-Yücel, 2009). Bi taybetî Clémence Scalbert-Yücel destnîşan dike ku ev term, ango peyva dengbêjîyê “hinekî çêkirî xuya dike” (2009: 14). Lê ihtimala nûbûna vê peyvê kêmtir e. Çimkî peyvên ku karê pişeyê nîşan didin, bi her du formên xwe jî di nav kurmancî de li kar in. Dibe ku zêde berçav nebibe û kêmtir hatibe xebitandin. Nimûneya li jêr, nîşan dide ku ji berê de ev peyv di nav civaka dengbêjan de hebûye:

E'vdal go: Ezê li dinîyayê gerîyam h'emû alî,

Min û teva **dengbêjî** kirîye, em tev gerîyane

bi h'elalî,

Bira ort'a meda hebe gilîyê saxlem, eşqa dila

bi h'elalî (Celîl & Celîl, 1978: 86)

Ji vê nimûneyê jî diyar dibe ku peyva dengbêjîyê, hê berî salan (1978) li Ermenistanê di nav dengbêjan de hatiye bikaranîn. Lê rast e, wekî ku Schäfers jî amaje pê dike, ev peyv bi rêya saziyên kurdî yên çandî berbelavtir bû, bi taybetî di nav weşanên nivîskî, gotarên devkî yên akademîsyen û entelektuelan de, gelek dengbêjên bi xwe jî peyva dengbêjîyê bi kar tînin bi taybetî yên ku bi saziyên çandî yên kurdî re di nav danûstandinê de ne (Schäfers, 2015: 6). Bi giştî meriv dikare bibêje ku herçiqas kêmtir be jî bikaranîna wê, wekî ku Scalbert-Yücel (2009: 14) îdia dike ew peyveke çêkirî nîne an jî çêkirî xuya nake, ji ber ku di nav kilamên din de jî ev peyv derbas dibe.

Mitirb, Begzade û Gewende

Îcrakarên ku wekî kategoriyeke cuda ya derveyî kurdbûn û eşîrbûnê bi navên wekî mitirb (mirtiv), begzade û gewende û qereçî dertên pêş di nav civaka kurdî de xwedî statuyeke civakî ya cuda ne û zewaca wan a bi kurdan re ne li gorî normên civakî ye. Li Serhedê ji bo wan navên begzade û mirtiv (mitrib) li pêş in, li Berfiratê ligel mitirb, gewende, kirîf û qurbet, navên sazband û aşiq jî bo vê statuyê hin caran tên bikaranîn. Yek ji wan kesên ku di behsa îcrakarên kurmancî de navê “mitirb” û “begzade”yan jî dide Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1863) ye.

Mela Mehmûd, derheqê çanda kilamgotin û dawetên kurdan de nav û wezîfe û heqdestê wan bi tevî atmosfera wê wiha dide:

Û dawetêd wan jî zaf bi deng û istiran dibin, ew bêrîte dibêjin. Dengbêjêd wan heyin, bêrîtan dibêjin, ew jî bi govend reqs dikin. Lakin jin û mêr, keç û law hemû têk da destêd yekûdu digirin û reqsê dikin. Û keçêd wan û jin di govendê da distirên û dileyzîn, lakin dibe ku daweta maqûlan da def û nay û kemaçe û defik û çînger jî hebitin. Emma **sazbendêd** wan **mitrib** in. Her tayfeyekî ji ekraan cida cida mitrib heyin ku xasî bi wan in. Ji biyaniyan mitriban nayînin (Çelik, 2015: 160; Dost, 2010: 68-69).

Ev behsa dawetên kurdên Serhedê yek ji wan qeydên herî kevn e ku tê de behs bi dengbêj, sazband û mitriban dibe û statuya wan a civakî tê ravekirin. Çawa ku tê dîtin, ev peyv ligel peyvên wekî dengbêj, sazband, mitrib hatiye bikaranîn. Ji neqilkirina Bazîdî diyar dibe ku karê sazbandiyê zêdetir bi destê kesên mitrib de ye û herwiha heqê mitriban jî ji sê paran parek e ji wan pez û diravên ku ji bo dawetê hatine komkirin. Ew kesên ku saz, def, çîngerê didin di dawetan de wekî mitrib û begzade derdikevin pêş meriv. Mela Mehmûd li dereke din dema behsa mitriban dike û taybetmendiyên wan dide, destnîşan dike ku di nav kurdan de navê wan “begzade” ne. Li ser mitribên ku navê wan li Serhedê û hin deverên din “begzade” ne, Mela Mehmûd wiha dibêje:

Û ji ekraan her tayfeyekî di nêva wan da nî çend mal **mitribêd** wan heyin ew **begzade** dibêjin. Ew **mitrib** feqîr elhal dibin û şolêd wan saz û soz û defqutan sazende ne. Li dawet û şayyan saz diqutin û mewîdetiyê dikin. Û jinêd wan jî ji malan parsê dikin. Bi vî terzî medarê dikin. Lakin ewan jî zimanekî mexsûse heyin ku bi xeyr ji **mitriban** kesek ewî zimanî nizanin û malêd xû da nî bi wî zimanî xeber didin. Lakin digel ekraan kurmançî xeber didin. Kes ji ekraan jinan nadine wan û ji wan jî jinan naynin (Çelik, 2015: 187).

Meriv fêhm dike ku li Serhedê ji mitriban re ji wê hingê vir ve begzade tê gotin. Şixulê begzadeyan “saz û soz û defqutan sazende ne”. Diyar e ji bo şahî û demên kêfxweşiyê begzade tim amade dibin. Li dereke din Bazîdî wiha behsa begzadeyan dike: “Kuro, de zû çend qurbanekan ser jê kin û bilanê begzade bîn û sazan bînin û bikine kêfxweşî û şayî” (Bilbil & Oztirk, 2019: 160). Ji neqilkirina Bazîdî tê fêmkirin ku li Serhedê û helbet li hin deverên din jî dengbêj, sazband, begzade û mitrib hene. Li Berfîratê jî yek ji wan qeyda dîrokî ya ku behsa vê zumreya îcrakaran dike Le Coq e (1903). Di metna bi navê “Hîkayeyî Gewende” de ku ji devera Kilîsê hatiye berhevkirin, ew bi dirêjî behsa gewendeyan dike; statuya wan a civakî û debara wan a wê hingê rave dike. Le Coq destnîşan dike ku gewende diçin dawetan sazê dikin û bexşîş û şebaşan werdigirin, axa mecidîye an jî zêran didin wan û piştî ku dawet diqede wan bi xelat dikin. Wekî din, gewende parsê dikin, ji nav xelkê bulxur berhev dikin û kevçiyên çêdikin. Meriv di metnê de rastî gotinên pejoratîf jî tê yê wê wekî “ser çavî xwe naşon”, “goştî mirar dixwun” û “kelîmeyî şehadet nizanin” (1903: 15-16).

Turgut (2018: 63) destnîşan dike ku nasnameya etnîk a mitriban “aloz”, “hesas” û “nezelal” e. Herwiha meseleya zimanê wan kêhm hatiye xebitîn û lîteratura li ser zimanê wan xalî ye. Bazîdî li ser zimanê mitrib û begzadeyan dibêje ku xasî civaka wan e û xeyr ji wan kes pê nizane. Îrora jî zimanê ku li

deverine cuda cuda mitirb pê diaxivin, zimanekî taybet e ku hê jî di nav wê civakê de li hin deveran tê bikaranîn. Bo nimûne, destanbêjê navdar Silêmanê Dengizî (1943-2024) dema ku bi keça xwe re bi domanî xeber dide, dibêje “ew jî zimanê me yê qereçiya ye” (GezGezok, 2022). Navên wan cihê cihê bin û zimanê wan ê dayîkê kurmancî nebe jî (hin deveran bi temamî kurmancî ye), tevkarîyeke hunerî ya mezin li çand û zimanê kurdî kirine. Bi taybetî li Mêrdîn û dorhêla wê ya berfireh *mitirb*¹⁷ û stranbêjên herêmî ku bi vî karî re mijûl dibin bi nav û deng in. Li hin deveran meriv rastî peyvên wekî begzade, axa, kirf, poşe/foşe, qereçî, dom¹⁸, dimon, doman, dûman¹⁹, qerqût, polatî, roman, aşîq, boşa, gewende, cengene/çingene, ciwelek û hwd. dibe ku hin ji wan binavkirinên navxweyî (endonym) hindek jî binavkirinên derveyî (exonym) ne. Lê ev hemû navên jorhatî îcrakariyên wan ên muzîkê nawesfîn. Ev kom carcar ji ber kar û sen’etê xwe tên binavkirin, hin nav bi temamî binavkirinên wan ên navxweyî ne ku nasname û zimanê wan²⁰ destnîşan dike lê bi demê re ji ber amûrjeniya wan navên wan ên qewmî rasterast li hin deveran wateya sazbandiyê hilgirtiye ser xwe. Ji bo heman diyardeya ku li ser têkiliya kar û griotên efrîqayî peyda dibe (bnr. Hale, 1997: 261).

Wateyên pejoratîf li ser mitirban ava bûne, lewma li hin herêman navên hurmet û rûmetê li wan tê dayîn, da ku ew wateyên pejoratîf xuya nebin. Li Serhedê “begzade” bi vî rengî ye. Begzade bi wateya xwe ya yekem gelemperî ji bo zumreyeke bilind a beg, mîr an jî eslî û torin de tê bikaranîn, lê bi mecazî tê wateya mitirban (Farqînî, 2022: 131). Herwiha peyva “axa” ku xwediyê payeyeke bilind e, ji bo muzîsyenên herêmî tê bikaranîn ku di şahî û dawetan de wekî gewende û dûmanan kar dikin (Sträuli, 2021: 25). Dîsa li Efrînê û derdora wê peyva kirf dibe peyveke wihareng. Bi rêya navê kirf²¹ ku saziyeke biqîmet a kurdî ye, wateyên xerab ên li ser navên wan kêmtir dibe. Bi vî rengî di nav çanda kurdî ya devkî de meriv dikare bi dehan navên têkildarî van îcrakaran bibîne ku hin ji wan bûne xwedî taybetmendiyên xweser û herêmî. Herwiha di nav çanda kurdî ya devkî de leheng/karakterên muzîsyen, bi taybetî mitirb di gelek destanan de jî rolên giring werdigirin ser xwe (Turgut, 2018). Ev deh salên dawî derheq taybetmendiya çanda amûrjeniya profesyonel a nîfşên cihê cihê yên mitirban,

¹⁷ Ev peyv jî li gorî devokan diqewime ku wiha biguhere: Mitirb, mitrib, mirtib, mitrib, mitrub, miturb, mutrib, mutirb, mutrub, muturb, mutrib, mirtiv. Ev peyv li hin deveran wateyeke pejoratîf a parsekiyê jî wergirtiye ser xwe.

¹⁸ Dum an jî dom wekî komeke stranbêj û sazbandan di nav peştûnan de û herwiha li Belûçistanê jî bi heman navî hene (bnr. Boyce, 1957: 43).

¹⁹ Dûman jî varyanteke peyva doman xuya dike ku di wateya kesê muzîkjen de bi kar tînin li Kobaniyê û derdorê wê. Carcar dema ku zimanê wan neyê fêmkirin jî wisa tên binavkirin. Bo nimûne, Mihemed Xelîl Xazî ku bi navê Mihemedê Dûman naskirî ye, bi eslê xwe berî çend bavan ji Kerkûkê koçberî Kobanî dibin û di nav malbatê de soranî xeber didin. Ji ber zimanê xwe yê malbatê û mijûliya xwe ya bi muzîkê ew jî wekî “dûman” tên binavkirin.

²⁰ Turgut (2018: 53) destnîşan dike ku zimanê mitirban “kurmancî” ye lê zimanê qereçiyê “domanî” ye û herdu kom jî misilman in.

²¹ Li Efrînê, kilamcî û tembûrvan û destanbêjê navdar Elê Kapê (Eliyê Kapê) bi xwe wekî kirfî tê zanîn (Hevpeyvîn ligel Hisên Xanî, 11/03/2025). Dîsa Henanê Nêsir (m. 1983) jî ku bi lîxistina zurneyê naskirî ye li Efrînê ji nofa kirfan e.

nav û repertuara wan, deximandin û wateyên pejoratîf ku li ser wan ava bûne, bere bere zêde dibin (bo nirxandina rol û temsîlên mitirban di çanda kurdî ya devkî de bnr. Çakır, 2022; Turgut, 2018; Keskin, 2016). Turgut destnîşan dike ku ji ber wateyên pejoratîf ên li ser mitirban bar bûne, li devera Torê di nav nîfşên nû yên mitirb û qereçyan de meriv pêrgî navên wekî *hunermend*, *dengbêj* û *hozan* tê (2018: 54).

Çawa ku tê dîtin, kêm-zêde statuya wan a civakî di nav kurdan de eynî ye, amûrjen in, li sazê didin û di dawetan de şabaşan werdigirin û ya herî giring jî kurd bi wan re nazewicin. Temsîlên wan ên di nav destanên kurdî de balkêş in û hin ji wan zorê didin rastiya civakî û gotarên (*discourse*) nû li ser statuya wan a civakî pêşkêş dike (bo zêdetir nirxandinan li ser vê temsîla mitirban bnr. Turgut, 2018, 2012).²²

Sazbend

Sazbend wekî peyveke berbelav a bi enstruman û sazkarîyê re têkildar, hema hema li her derê tê dîtin, lê li hin deveran rehendên wateyî yên xurttir wergirtiye. Bo nimûne, berovajî Serhedê ku peyvên dengbêj û şair zêdetir dertên pêş, li herêma Berfîratê li gel peyva şair, aşiq û kilamcî peyva sazbandê jî carna wekî kategoriyeke serbixwe carna jî wekî navê îcrakariyeke giştî ya kilambêjiya kurmancî dertê pêş. Lê bi giştî dema ku meriv li herêma Berfîratê dinêre, bi awayekî eşkere peyva sazbandê zêde tê şixulandin. Di lêkolîna xwe ya bi navê *Dewrêşê Evdî — Dewresh, Son of Evdî* de Sträuli (2017: 14) termînolojiya herêmî ya îcrakarên devkî yên derdora Rihayê nîqaş dike û destnîşan dike ku kesên salmezin ji bo stranbêjên xwe bi taybetî dibêjin *sazbend* û ji bo vegêranên epîk û evînî yên repertuara xwe jî peyva *delal*, *saz* an jî *kilamê* bi kar tînin. Di ferhenga wan a herêmî a salmezinên derdorê Sirûcê de peyvên wekî *dengbêj* û *destan* xuya nakin (bo zêdetir agahiyan bnr. Sträuli, 2017: 14). Sazbend li Serhedê nispeten bi çanda begzade û mitirban re hatibe têkildarkirin jî, ev girêdana wateyî ya peyvê ya bi îcrakar re li herêmên din sist dibe û kurd bi xwe jî peyva sazbandê bi kar tînin ji bo îcrakarên kurmanc. Bi taybetî jî li Herêma Çiyayê Kurmênc ku meriv dikare bibêje ji aliyê aşiq, sazbandî û destanbêjiyê ve di nav kurmancan de herêmeke pêşketî û dewlemend e. Li Berfîratê peyvên şair, sazband, aşiq, kilamcî û kirîf dertên pêş, peyva “*dengbêj*”ê herçiqas ji aliyê xelkê ve bê zanîn û di nav vegêranên devkî de cih bigire jî wekî navekî xwepênasekirana hunerî ya îcrakarên vê deverê zêde

²² Turgut li ser Cembelî kurê Mîrê Hekariya nav û temsîla “mitirb”an şirove dike. Lê hêjayî gotinê ye ku heman destan/kilam dema ku li deverine cuda tê gotin, karakterê giring ê bi navê “Ehmedê Mitirb” li Efrîn û Kilisê dibe “Ehmedê Gewende” (bnr. Le Coq, 1903: 20-26; Jindires, 2019c) an jî dema ku li Serhedê ji aliyê dengbêjan ve tê gotin, ew karakter dibe “begzade” û “mirtiv”. Ev diyarde derbasdarî, hinkûfî û binavkirinên van îcrakaran di nav kurdên li deverên cuda de nîşan dide. Carcar di nav destanekê de ji yekî zêdetir nav tên bikaranîn. Bo nimûne, dema ku Hesên Nazî “Helîm Xatûnê” dibêje, ji bo karakterê muzîkjen Omê Kirîf (Omikê Kirîf an jî li derdora Mêrdînê Omokelika) wekî “kirîf” tê binavkirin û carcaran jî ew karakter bi navên wekî “mirtiv”, “sazbend”, “tembûrcî”, “aşiq” ve tê wesifandin.

xuya nake. Lê dema meriv li roja îro dinêre, tê dîtîn ku peyva “dengbêj”ê bi rêya bernameyên cihêreng ên televîzyonê li van herêman jî belav bûye.

Herçiqas li gelek deveran berbelav be jî, meriv dikare bibêje ku navê sazband(î), herî zêde li herêma Berfîratê dertê pêş û di derûdormeyê vê herêmê de zêdetir xuyanî dibe (bnr. Delikaya, 2023). Li vir herçiqas navê sazband enstrumanê bîne bîra meriv jî, sazbandî her tim bi enstruman nîne, ew rasterast di dewsa peyva dengbêj/şair/kilamci de tê bikaranîn. Li vê herêmê û bi taybetî li Rihayê, peyva sazband dêvla peyva stranbêj de tê bikaranîn û sazband bi xwe saz an jî enstrumaneke din lênaxin. Ev yek destnîşan dike ku ev peyv, li seranserê erdnîgariyeke berfireh wate û fonksiyonên cihêreng hildaye ser xwe. Eger meriv lê binêre meriv dikare bibêje ku sazband li ser çar awayên îcrakariyê jî tên dîtîn:

- a) *Kilambêjî û destanbêjiya bê enstruman*: Çawa ku me li jorê jî destnîşan kir, sazbandî carna kilambêjî tenê ye, ligel kilamê saz û tembûrek nîne ku îcrakar bi kesekî amûrjen re kilama xwe bibêje. Di wateya xwe ya yekem û giştî de meriv dikare bibêje ku ev peyv ji bo îcrakariya kilam/stranê tê gotin ku bi temamî bêenstruman e û li gel wan jî kesekî sazband nîne. Ev yek bi taybetî li Deştê Sirûcê dertê pêş. Li vê deverê peyva sazband bi temamî di dewsa stranbêj/dengbêj de tê bikaranîn lê peyva dengbêj bi xwe ji wan kilambêjan re nayê gotin (Sträuli, 2021: 84). Helbet bi heman rengî ev peyv li Semsûr û derdora wê jî kêmbêrê de bi heman rengî tê şixulandin.²³ Bo nimûne, li Semsûrê, sazbanda navdar Êma Sazband (1936-2021) ku bi navê sazbandiyê navdar bûye saz lê nedixist. Herwiha meriv dikare sazbandên ku Oskar Mann di sala 1906ê de li Rihayê ji wan gelek destan, kilam û vegêranên eşîriyê berhev kirine, yên bi navê Şêx Bozan û Osmanoğlu di vê kategoriye de bihesibîne (bo zêdetir agahiyên li ser van herdu sazbandan, bnr. Sträuli, 2021).
- b) *Kilambêjî û destanbêjiya bi enstruman ji aliyê kilambêj bi xwe ve*:²⁴ Li gelek deveran ji wan kesan re sazband tê gotin ku hem dibêjin hem jî saz, tembûr, def an jî ribabê lêdidin. Ev kategoriya herî berbelav a sazbandiyê ye, li deverine cuda, bi enstrumanên xwe yên wekî saz, tembûr, ribab û hwd. gelek îcrakarên bi vî rengî û bi vî navî dertên pêş. Li Herêma Berfîratê, piraniya îcrakarên kilaman an jî “kilamên tûraz” bi vî awayî îcra dikin.²⁵

²³ Divê bê zanîn ku derveyî van herêman jî ev peyv bûye xwedî wateyên cihê cihê, lê li vir mebesta me tenê hin xal û xetên sereke yên bikaranîna van peyvan e, an na ji bo ku meriv bikare hemû deveran bikole jê re daneyên berfireh û xebateke mezin divê.

²⁴ Hem kilamgotin hem jî sazkarî bi hev re jî mîj ve xwedî nîrxekî bilind e. Ev cure vegêran û amûrjenî ji qedîm de di nav mîletên îranî de tê dîtîn. Boyce (1957: 18) li ser vê yekê dibêje ku ji bo partiyên tîkiliya muzîk û şîrê gelek xurt bû, kesek nikaribû bibûya şairekî (dengbêj) profesyonel eger ne xwedî şiyana lêxistina enstrumaneke û dengekî xweş bûya.

²⁵ Li Efrînê îcrakar ji vegêranên dirêj ên wekî destanan re dibêjin “kilamên tûraz”, ev tabîrê tê wateya kilamên ku ji şairan re mîras mane, bi taybetî destan û kilamên dirêj ên ku ji berê û paş de ji aliyê

- c) *Kilambêjî û destanbêjiya ku ligel amûrjenekî din tê îcrakirin.* Bo nimûne, li Devera Efrînê Mehmedê Seydo an jî Bavê Seydo (1928-1993) dema ku Eyşa Îbê îcra dike, tembûrvanê navdar Elî Êgêl ê ji navçeya Şiyê pê re tembûrê lê dixê (Jindires, 2019a). Wate, kesê ku kilama xwe îcra dike ango Mehmedê Seydo enstrumanê lê naxe, ew tenê li vegêrana xwe hûr dibe û ligel wî tembûrvan meqam û serdûrê kilama wî pê re lê dixin heta ku vegêrana wî temam bibe. Dîsa li heman deverê, dema ku Mehmed Şerîf, destana Dewrêşê Evdî îcra dike di sala 1973yê de, Mehmed Elî Tîco, bi wî re sazê lê dixê heta ku Dewrêşê Evdî diqede. Herwiha, hunermendê navdar ê Efrînê Cemîl Horo tê zanîn ku bi xwe amûreke muzîkê lê nedixist (Yaş, 2016: 120-124). Dîsa ji gundê Naza yê Efrînê, Evdîlqadîrê Hesnazî bi xwe jî saz lênedixist, herçiqas bavê wî û dû re lawê wî di vî karî de gelek pêşketî bin jî (bnr. Arta, 2023).
- d) *Sazbendiya bê kilam û gotin:* Safî saz an jî sazbandiya bêkilam û gotin li devera Efrînê çandek e ku ji qedîm ve heye. Xurtbûna amûrjeniya vê herêmê, bi xwe re pêşketineke meqamên muzîkê jî aniye û destan û kilamên vê deverê li gorî meqam û besteyên xwe bi enstruman tê îcrakirin bêyî ku kilam, destan an jî stranek pê re were gotin. Ji ber ku ji aliyê sazkarîyê ve ev herêm bi rastî jî pêşketî ye, li vê herêmê îcrakariya bê enstruman gelekî kêmtir e, ew jî bi gelemperî qeydên amatorî ne ku sazbandek peyda nekirine an jî bi xwe wisa tercîh kirine. Bo nimûne, Reşîdê Cîndo (1896-1983) destana Ferza Çola û Destana Dewrêşê Evdî bi temamî bê enstruman îcra dike (Jindires, 2022a; 2022b). Meriv dikare vê diyardeyê jî bi awayê vegêrana Reşîdê Cîndo re têkildar bifikire, ji ber ku ew destanê herçiqas ji aliyê dirûvê ve wekî helbest vegêre jî, deng û sewta xwe wekî kilamciyên vê deverê bilind nake û destanan bi formeke nêzikî çîrokan vedigêre. Bo nimûne, tembûrvanê herî bi nav û deng ê devera Efrînê, Adîk an Adîk Hesnecarî an jî Bavê Henên (1907-2007) ku bi xwe jî necarê tembûrê ye ku li seranserî vê herêmê navdar bûye, qeydên xwe hene ku tê de tenê li tembûra xwe ya taybet dixê ku wî ji bo xwe çêkiriye. Tembûrên ku bi gelemperî 24 perdeyî an jî zêdetir perdeyî ne, tembûra wî ya ku wî ji bo xwe çêkiriye ji 18 perdeyan pêk tê (bo îcrakariyên wî, bnr. Jindires, 2007; 2013). Dîsa bi heman rengî, di nav xelkê deverê de ji ber ku safî saz û tembûr tê hezkirin qeydên bi sazê yên salên 1970-80yî gelek in. Hin ji wan qeydên enstrumanê bi temamî saz an jî tembûr in, hin ji wan bi temamî zirne ne.

Di gelek qeydên kevn ên nivîskî û devkî (destan, çîrok, kilam û hwd.) de meriv rastî peyva sazbandê tê. Eger meriv nimûneyekê ji vê herêmê bide, meriv dikare berhevkarîyên Oskar Mann ên ji vê herêmê wekî nimûneyên pêşîn

bihesibîne ku tê de sazband û qedirgirtina wan a ji aliyê serekên kurdan ve hatiye tomarkirin. Oskar Mann dema li Rihayê berhevkarîyên kilam û destanên kurmançî dike, li wir vegêraneke kilamkî ya bi navê “Temir Paşa û Sazbandê Wî”²⁶ jî ji devê Şêx Bozan qeyd dike:

Wexta bû Paşa weha bî: rakir hezar suwar, ji Qerejdağê suwar bû, gihîşt çiyayî Bîşîrê, malê Aneza li çiyayî Bîşîrê. Heft qonax cû, talan kir, bîst hezar deve anî û hate Ferêt. Bi rê de ata, da xelkê. Ji Ferêt derbaz bû, heştê deve ma. **Sazbandekê** wî hebû. Jê re go, “Kelamekê bibê!” **Sazband** go,

“Qerejdağ zozan kepirî,

Kon(ê) erebî yourdum çadir ê,

Bavê Eyûb suwarê Dündülê.

Dêlê wî ji perê naman, bêjiyê wî ji pelgê gulê.

Temir Paşa xar çêkir Qerejdağê,

Talan anî ji çiya Bîşîrê. Ata da **sazband** çel deve.”

“Bijî”, go, “Yeke din bibê.” (Sträuli, 2021: 84-85).

Ev qeyda dîrokî (1906) ku li Berfîratê hatiye berhevkirin, nîşaneya wê yekê ye ku sazband û afirîneriya wan tê hezkirin û piştgîrî li wan tê kirin. Paşa diçe seferê li Çiyayê Bîşîrê li jêra Reqayê û talanê bi xwe re tîne, di rê de wê belav dike. Her cara ku sazbandê wî bi pesindarî li ser wî benêde kilamê dibêje, xweşa Paşa pê re diçe û çil deveyan wekî diyarî (ata) dide sazbandê xwe. Di vê nimûneyê de çawa ku jorê jî hate destnîşankirin, peyva sazbandê îşaretê bi saz an jî enstrumanêke din nake û sazband bi xwe jî lînaxin. Peyva sazê, li vê herêmê wateyeke din jî bi dest xistiye û di dewsa peyvên wekî kilam û destanan de jî tê şixulandin. Ango “saz” nayê lîxistin, lê tê gotin.

Aşîq

Herçiqas di nav tirk û azerîyan de çanda aşîktiyê gelekî li pêş be jî, ev peyv di nav vegêranên kurdî yê devkî de jî cih digire û li herêmeke berfireh kesên ku bi vî navî îcrakariya xwe ya hunerî bi nav dikin, ne kêmtir²⁷. Bi taybetî li Berfîratê û helbet li deverine din jî ev peyv berçav e. Li derdora Dêrsimê, li Sêwas û Erzincanê, li Semsûr, Meraş û Kilîsê herwiha li gelek deverên din ên kurdnişîn, kurd ji aliyê dîrokî, çandî û civakî ve bi gelên cînar, bi taybetî jî bi tirkên re (berê bi ermenî û suryanîyan re jî helbet) di nav têkiliyên xurt de bûn û danûstandinên dewamdar û dewlemend, tesîr li hilberînên çandî û repertuarên îcrakaran jî dikir.²⁸ “Aşîk”ên tirkên hebûn ku bi civaka kurd re di nav danûstandinên civakî de

²⁶ Ev nav ji aliye Barbara Sträuli ve li “kelam”ê hatiye danîn, ji ber ku bînav bûye.

²⁷ Li Tirkîyeyê û Azerbeycanê navên wekî aşîk, ozan tîne nasîn ku navîne din jî hene ku ji mêj ve di nav gelên tirkîziman de tîne dîtin.

²⁸ Meriv dikare gelek berhemên hevpar jî bibîne di navbera çandên devkî yê kurdî û tirkî de. Bi taybetî hebûna destanên wekî Arzi û Qenber, Aşîq Xerîb, Ferhad û Şîrîn, Tahir û Zuhre, Leyla û Mecnûn, Koroxlî û Betalê Qazî hwd. di her du çandan de asta danûstandinên xurt di navbera aşîk û şairên tirk û dengbêj û şairên kurd de nîşan dide.

bûn. Helbet, aşikên navdar ên ku bi eslê xwe kurd jî hene ku bi vegêranên xwe yên bi tirkî ve bi nav û deng bûne.

Têkilî û danûstandina di navbera du çandên cuda de li herêmên ku tirk û kurd bi hev re dijîn, tişteki ne seyr e. Bo nimûne, yek ji wan aşikên herî navdar û di hunera xwe de pêşketî Aşık Davut Sulari (1925-1985) yê ji Erzincanê ligel birrek türküyên xwe, kilamên kurmançî (bnr. Kurdên Alawî, 2015) û zazakî jî gotine ku qismek ji van kilaman bi têkeliya tirkî û kurmançî an jî zazakî pêk tînin (bnr. Polatdersim, 2009). Dîsa, Alîşêr Efendî bi şairî û aşiktiya xwe ve naskirî ye, piraniya berhemên xwe bi tirkî û qismekî wan ê biçûk jî bi kurmançî îcra kirine. Ji van herdu nimûneyan jî diyar dibe ku têkilî û derbasdariyeke xurt di navbera çanda devkî ya kurdî û tirkî de heye û peyvên wekî şair û aşik/aşiq di herdu çanda de jî wekî têgehên hevpar in (bo danberheviyeke van herdu çandan, bnr. Kardaş, 2017). Li Serhedê jî gund û navçeyên ku kurd û tirk bi hev re niştecîh in, dema ku aşiqên gerok ên tirk dihatin nav civatan, kurd jî diçûne guhdariya performansên wan. Ji aliyê sazkarîyê ve meriv dikare bibêje ku ferqek heye di navbera “dengbêj” û “aşiq û sazband”an de. Ev ferq zêdetir bi enstrumanbûna sazband û aşiqan e ku nispeten dengbêj kêmtir bi mûzîkê ve dibêjin. Evdalê Zeynikê, rasterast xwe di kilamên xwe de xwe wekî şair û hin caran jî dengbêj bi nav dike, lê em rast lê nehatin ku Evdal xwe wekî aşiq pêname kiribe. Wisa diyar dibe ku bi îcrakariyên xwe yên bi enstruman ve sazband û aşiq li Serhedê jî dengbêjan cuda dibin, ji ber ku pirraniya dengbêjên vê herêma bêyî saz û tembûrê kilamên xwe dibêjin. Li ser van her sê navan, Celîl û Celîl (2014a: 13) dibêjin ku di nav kurdan de “gele dengbêjên profesyonel, aşiq û çirokbêj hene. Dengbêj bê rêberiya zurnê, meyê, dutarê û tembûrê distirên, ew bi deng, tek bi deng distirên, lê aşiq sazê dixin û pêra distirên.”

Wekî ku meriv di binavkirinên cureyên din ên vegêranên kurdî yên devkî de dibîne, wate û temsîla van peyvên li her deverê ne eynî ye. Li Serhedê kesên ku xwe dengbêj an jî şair dibînin, xwe wekî aşiq pêname nakin. Lêbelê, dema ku meriv bal û dîna xwe ber bi herêma Berfîratê dibe, bi taybetî jî li Efrînê peyva aşiq ligel peyva “şair”ê di nav çanda kurdî bi xwe de dertê pêş û ev peyv di pêwendî xwe de îşaretê bi aşikên tirkîziman nake. Lewra rasterast kilambêjên vê deverê xwe wekî aşiq pêname dikin. Bo nimûne, li Efrînê dema ku Henanê Evdê Şerê behsa bavê xwe Evdê Şerê û apê xwe Hesên Nazî dike wan herduyan wekî “aşiq û şair”, dîsa dema Mecîd Hemgulî behsa tradîsyona berî xwe û navên pêşeng dike, ji gundê Naza re dibêje “cîyê aşiq û şaira”:

Em rûniştine li Çiyayê Seydo, Cebelseydê li mala pîsmamê min, Evdîlqadir lawê apê min
Hesên Nazî²⁹, bavê Hesên. Evî van gotinana dike Henan lawê Evdê Şerê³⁰, pîsmamê
Evdîlqadîr, herdu kurê aşiq û şairan e (Jindîres, 2019b).

²⁹ Hesên Nazî an jî Hesnazî (1889-1989), aşiq, şair û destanbêjê navdar ê Efrînê ye. Bavê şair û destanbêjê navdar Evdîlqadir Hesên Nazî (1938-) ye.

³⁰ Evdê Şerê (1870-1961), aşiq û şairê yê Efrînê ye, birayê Hesên Nazî ye. Evdê Şerê bavê Henanê Evdê Şerê ye. Henan jî mîna pîsmamê xwe Evdîlqadir Hesên Nazî destanbêjekî xurt e.

Çawa ku tê dîtîn, li Efrînê du nûnerên herî navdar Hesên Nazî (1889-1989) û Evdê Şerê (1870-1961) ji aliyê civaka xwe ve wekî aşîq û şair, gundê wan jî wekî “cîyê aşîq û şaira” tên pênasekirin. Li vir, meriv dikare bikeve gumanê gelo wan jî xwe wekî şair an jî aşîq didît û bi nav dikir an ev jî wekî binavkirinan têgeheke derveyî ye? Xwepênasekirin û xwebinavkirina Hesên Nazî di kilameke wî bi xwe de ku tê de qala xwe dike, wiha derbas dibe:

dilê mi rabû, bû ava asê
mi bang kir û kire gazî
li pîşa mi bû defter û yazî
mi xerbilandin pir şairê wekû Mişo Beko Berazî
ku wextêk werê ez ê bimirim
hûnê bêjin ka şairê mîna Hesên Nazî

Hesên Nazî an jî Hesnazî (1889-1989) dema ku xwe bi ser îcrakarî û hunera xwe re pênase dike, xwe wekî aşîq û şair bi nav dike. Hêjayî bibîrxistinê ye ku ev malbata jî gundê Naza ku bi aşîq û şairên xwe ve dewlemend e, vêga jî bi karê sazbandî û hunermediyê re mijûl e û nebiyê Hesên Nazî, kurê Evdilqadir ê bi navê Ekrem Nazî (1968-) bi sazbandiya xwe ya folklorîk ve şopa bav û kalên xwe nade jîbîrkirin. Di varyanteke kilama bi navê Xwerzî Mihemed de ku wî li ser mirina xwarziyê xwe çêkiriye, Hesên Nazî xwarziyê xwe wekî aşîqê Çiyayê Kurmênc bi nav dike:

di bextê we da me
hûn ê bi serbaşî xort û ewêla ra
sergovendî daweta ra
aşîqê Çiyayê Kurmanc ra
xudanê gurzê simêlan ra daxin
belgiya cî û doşeg û orxanê
(Ferhad Omar Fawzy, 2023, 9:30)

Ji vê nimûneyê tê dîtîn ku eger meriv danberheviyekê çêbike di navbera peyva aşîq û şair de, meriv dibîne ku peyva “şair”ê pozîsyoneke taybet a afirineriyê destnîşan dike, beramber vê, peyva “aşîq”ê ji aliyê pozîsyona xwe ve jî navê şairtiyê jêrtir e li vê herêmê. Herwiha kilambêj ku navê aşîq wekî inwana pîşeyê xwe bi tevî navê xwe dibêjin, çawa ku di çanda aşîktiya tirkî de jî berbelav e. Yek ji wan kesan Aşîq Selîmê Cizîrî (1937-2011) ye ku bi dehan kilam û destanên kurdî li dû xwe hiştine. Dîsa di zazakî de jî kesine ku destan û hikayeyên gelêrî îcra kirine, bi navê *aşîk/aşîq* hatine binavkirin. Aşîk Cumo (1926-2010) yek ji wan kesan e ku bi dehan destan û hikayeyên gelêrî bi kurmancî û zazakî îcra kirine û wekî *aşîk* hatiye binavkirin û hezkirin di nav xelkê de (bo jîyan û destanên wî bnr. Yazar, 2018). Herwiha, ev peyv di nav kurdên Xoresanê de jî bi heman awayî tê bikaranîn. Li gorî Blum (1972: 31) ku li ser çanda devkî ya kurdên Xoresanê

xebatên pêşeng kirine, wekî têgehekê ku “muzîsyenên profesyonel” îfade dike, têgeha aşiq (*asheq*) herî zêde îşaretê bi îcrakarên kurd dike, beramberî vê, têgeha baxşî (*bakhshi*) bi gelemperî tirk in (helbet ne hertim).

Şair

Di nav kategoriyên îcrakarên çanda kurdî ya devkî de ku me heta nika rêz kirin, navê şair³¹ xwedî statu û nirxê herî bilind ê civakî xuya dike. Ji kurmancên Serhedê, ji nav kirmanc/zazayên Dêrsimê heta başûr-rojavayê Berfîratê, ji wir heta beriya Mêrdînê û nav êzidiyên Şengalê, ji wir jî heta nav çanda soranî ya devkî, li seranserê cografyayê berfireh meriv wekî kategoriyeke xwedî pozîsyoneke bilind û bi nirx rastî peyva “şair”ê tê.³² Wisa xuya ye ku ev peyva li seranserê cografyaya kurdîziman dertê pêş û kêr-zêde xwediyê heman wateyê ye. Ev cografyaya ku bi pir-şêwezarî (kurmacî, zazakî, soranî, hewramî) û bi pir-baweriyê ve (sunnî, elewî, êzidî) di nav sînorên netewedewletan de parçebûyî ye, têgeha “şair”ê bi gelemperî heman îcrakariya çanda devkî destnîşan dike. Herçiqas li hin herêman wateya wê ya afirînerî/şairtiyê kêmtir xuya be jî, bi giştî şair xwedî pozîsyoneke taybet û bilind e di nav îcrakarên din ên wekî dengbêj, meqambêj, mitirb/begzade, aşiq û hwd. de. Ên ku pir caran ji aliyê lêkolînerên xwecihî û biyanî ve di bin çend têgehên şemsiye de tên pêşkêşkirin.

Bi nêrîneke navxweyî ya ji nav tekstên performansên şairan nêzikayî li termînolojiya xwecihî bê kirin, tê dîtin ku wate û giringiya ku ev peyv derdixe pêş ji aliyê şairan bi xwe ve jî hatiye destnîşankirin. Herwiha, deqên kevn ên kilaman di vê xalê de nêrîn û termînolojiya navxweyî ya berê baş nîşan didin. Jixwe ev têgehên ku ji nav vegêranên devkî derdikevin, ji adet û têngîhiştina xwe ve xwedî paşxaneyêke tarîxî û xurt in. Herçiqas, îro ev peyva şair, hem ji ber etîmolojiya xwe, hem jî ji ber ihtimala tevliheviya ku diqewime çêbike bi şairên nûjen/klasîk re, ji aliyê peyvên wekî “hunermand”, “hozan”, “dengbêjê gelêrî” ve hatiye paşxistin û ji aliyê lêkolîneran ve êdî kêr-zêde bikaranîn an jî bi xemên yekkirina termînolojiyê û neteweperweriya zimanî ve bi temamî tê paşguhkirin. Li vir jî bo zelalkirina bikaranîn û statuya hunerî ya têgehê ji herêman cuda nimûneyên ji nav deqên kilaman an jî qadê, dê bên pêşkêşkirin. Evdalê Zeynikê xwe wekî “şairê dinê” (Celîl & Celîl, 2016: 419) dihesibîne. Dema meriv li dor têgehan dinêre, ferqa dengbêj û şair di babeta sermiyanê de dertê pêş. Kesê ku “sermiyana wî ji kisê wî” be, angû kesê ku ji ber xwe ve kilaman derdixe, serê wî di lecan de tim rihet

³¹ Ev peyv jî di nav şêwezar û devokên kurdî de bi formên wekî şair, sayer, saîr, şa'ir, şayîr, şoêr, şayêr û hwd. tê dîtin. Peyva “şayêr”ê bi taybetî li Behdînanê ji bo îcrakarên edebiyata devkî tê bikaranîn û ji aliyê wateya xwe ve jî ev peyv bi vê telafûza xwe ve ji “şair”ên klasîk cuda bûye. Bi vî rengî, “şayêr” bo çanda devkî, “şair” ji bo çanda nivîskî tê bikaranîn (Hevpeyvîn ligel Tehsîn Îbrahîm Doskî, 13/11/2024).

³² Boyce (1957: 21) li ser vê peyvê û bikaranîna wê di erebî û farisî de agahîyan dide û dibêje di nav kurdan de peyva şair ji bo nivîskariyê tê bikaranîn û ne di wateya şairê devkî (*oral poet*) de. Herwiha ew dibêje kurd peyvên herêmî yên wekî dengbêj û dom bi kar tînin di dewsa şairê devkî de. Çêdibe ku ku wê demê bi tîra xwe materyal li berdest nebûn, lewma ew gihîştê vê qenaetê.

e, ji ber ku kilamên kesên din nabêje.³³ Wate, ew kes wezîfeya neqilkirina kilamên şair û dengbêjên berî xwe hîlnade ser milê xwe û ji ber xwe “kilamên teze” dernaxe, lewra kilam û gotinên nû demildest tîne ferqkirin ji aliyê dengbêjên ku hay ji repertuara herêma xwe hene. Lewma dema ku Şair Mistefayê Xelê Heyran (1897-?), di rasthatina xwe de ji dengbêjekî re meydane dixwîne, di lecê de jê re wiha dibêje:

Kilamê te isa bûne nota giroşê Êrîse berê, wexta Nîkalo nayê firotanê

Tu bîne bike nav destmalê [...] bavê koşê dikanê

Kilamê te yê teze heye, Mistoyê Heyran ra were meydane!

(Hevpeyvîn ligel H. Mihemedê Ferman, 1/8/2020)

Ji vê nimûneyê jî ew diyarde kifş dibe ku eger îcrakar xwediyê gotina xwe be û qabiliyeta wî/wê ya afirandina vegêranên nû (teze/ecer) hebe, ev yek di lecan de jê re dibe palpişt. Ev babeta ku di kilaman bi xwe de jî tê vegêran yek ji wan ferqên sereke ye ku şairiya kesekî/ê diyar dike:

Gulê, me'rûmê, ez wextekê E'vdalê Zeynê bûm,

Şa'rê dinê bûm,

Şarûr û bilbilê oda Surmeli-p'aşa, oda a'mê bûm,

(Celîl & Celîl, 2016: 419)

Ji Devera Behdînan ligel peyva meqambêj, peyva şair gelek li pêş e. Ji vê deverê meriv dikare gelek nimûneyên xwe-pênasekirinên wek “şair” bibîne. Bo nimûne, Hesên Elî Xençer dema behsa bavê xwe dike, dibêje “bavê min şair bû” (Waar Media, 2023, 10:27), Mihemed Pîro bo malbata xwe dibêje “qedîm da maleke şair in” (Behary, 2022: 1:21). Silêmanê Remo wekî “şairekî qedîm” tê pêşkêşkirin (bavê lawin, 2020). Dîsa ji Mêrdînê Reşîdo behsa xwe dike berî ku destanekê bibêje, xwe wiha pênase dike:

ez Reşîd im

bavê Kinê me

şairê dinê me

gurçika gê me

her kesê min nehewîne

bi zorê mêvanê wê me (Berekat Özmen, 2024: 0:08).

Çawa ji nimûneyan jî tê dîtin, ji Serhedê heta Berfiratê ji wir heta Behdînan û Botanê di nav hemû kurmancan de wekî peyveke xwe-pênasekirina îcrakarên kurmançî “şair” derdikeve pêş. Hêjayî gotinê ye ku ev peyv di nav soranan de jî bi rengekî çalak wekî şayer an jî şayîr tê bikaranîn. Di xebatên li ser çanda kilamgotinê ya zazakî/kirmanckî de ev peyv gelekî berçav tê bikaranîn (bnr.

³³ Di lecên dengbêjan de xaleke giring û bingeîn ew e ku kilam divê neqede, kesê ku herî zêde bi kilam û sermiyana xwe ve zora ên din dibe, bi ser dikeve.

Cengiz, 2010; Taş, 2017; Çiçek, 2024; Bakşî, 2019). Meriv di nav kilamên şair/sairê navdar ê Dêrsimê de jî vê navî gelek caran dibîne (bnr. Cengiz, 2010: 74, 229). Bo nimûne di manîyeke derbarê wî de ku di nav xelkê de belav bûye wiha tê gotin:

Sey Qaji melemê serê derd u dirtvetuno

Çiçeğê cem u cematuno

Sagirt niyo, **sairê** Kirmancuno (Cengiz, 2010: 90)

Nimûneyên ji nav kilamên şair/sairên kirmanc/zaza yên bi vî rengî gelek in. Ev jî nîşan dide ku ev peyv ji berê de di nav zazayan de jî tê şixulandin û hîn jî têgeha sereke ye ji bo ew kesên ku kilam û lawikan³⁴ dibêjin.

Kilamcî

Peyveke din a ku li derdora Berfîratê, Dêrsimê û Efrînê berbelav e, peyva kilamcî ye. Deverên ku peyva dengbêj, sazband û hwd. bi kar naynin, di dewsê de peyva *kilamcî* îqame dikin. Kilam, kulam, kelûm an jî kelam yek ji wan peyvan e ku ji Erdexanê heta Efrînê, ji Dêrsimê heta Behdînan û Hewramanê³⁵ carcar bi wateyên cuda be jî tê bikaranîn. Kilam hem bi wateya stranên dengbêjan ên dirêj, bi taybetî yên ne govend û dawetan tê bikaranîn, hem jî ji bo vegêranên dirêj ên wekî destanan tê bikaranîn; wekî *kilamê turaz*, *kilamên qedîm*, *kilamên kevn*, *kilamên dirêj* û hwd. (bnr. Delikaya, 2024: 1199). Îcar ew kesên ku kilaman dibêjin, li hin deveran xwe wekî *kilamcî* dinavînin. Di nimûneya jêr de, li Efrînê dema ku Reşîdê Mem Çûçanê (1924-2013) kilama Ereba Salih Begê dibêje, di destpêka kilamê de kesê ku danasîna Reşîdê Mem Çûçanê dike wî wiha terfî dike:

Li vê dinyê herkes dibê ez didim kilaman, herkes dibê ez **kilamcî** me. Em jî dibên mitribkî³⁶ me heye, stranbêjkî me heye, jê ra dibên Reşîd Bavê Seleh (Jindires, 2012).

Peyva *kilamcî* ligel çend peyvên din li Efrînê û bi giştî jî li Berfîratê tê bikaranîn. Hin îcrakarên vê herêmê xwe wekî *kilamcî* terfî dikin. Bo nimûne, ji Besniya Semsûrê, Elî Dore (j. 1952) ku bi salan hem bi kurmancî hem jî bi tirkî hunera xwe îcra dike, di nav xelkê de wekî *kilamcî* û *aşiq* tê zanîn. Ew derheq vê binavkirinê de dibêje ku ew van salên dawî bi tecrûbeya xwe ya televîzyonê re hînî peyva dengbêj bûye û wekî dengbêj li wan platforman tê binavkirin. Li gorî Elî Dore, li herêma wan berê kesên ku karê kilamgotinê dikirin wekî *kilamcî* dihatin binavkirin, xelkê digot “*kilamciyê gundê me*” (Hatun Sürücü, 2024: 77) Hêjayî bibîrxistinê ye ku ev peyv di nav kurmancên elewî û kirmancên Dêrsimê de jî tê dîtin. Li Dêrsimê jî, di nav îcrakarên kurmanc de, peyva dengbêj nehatiye

³⁴ Lawik hem di nav kirmanc/zazayên Dêrsim û Qocgirî û Çewlîgê de (bnr. Şahin, 2016; Düzgün, 1992) hem jî bi taybetî di nav kurmancan de di dewsa kilamê de tê bikaranîn (bnr. Allison, 2001: 65, 65).

³⁵ Kelamxwan ji bo wan kesên pîspor tê gotin ku repertuara muzîkal a Elhî Heq îcra dikin, kelaman û defteran ji ber dikin û dixwînin. Kelam vegêranên dînî ne, li ser îcrakarî, repertuar û çanda kelamxwanan, bnr. Hooshmandrad, 2022).

³⁶ Li Efrînê, ev peyv di wateya muzîsyen û sazband de tê bikaranîn, mîna derdora Mêrdîn û Batmanê xwedî statuyeke cuda ya civakî nînin. Ji wan kesan re zêdetir kirîf an jî qurbet tê gotin. Li vir ev rewş ji ber heman peyva erebî û wateya wê ya adetî rûdide.

bikaranîn, di dewsa wê de peyva *kilamci* hatiye gotin. Bo nimûne, hunermendê navdar ê ji Xozatê Mahmut Baran (1923–1975) ku hunera xwe bi zazakî, kurmançî û tirkî îcra kiriye wekî “kilamci” hatiye pênasekirin (bnr. Greve, 2018: 96).

Encam

Cihêrengiya termînolojiya edebiyata kurdî ya devkî di hemû cureyên devkî de derdikeve pêşberî merivan. Wekî peyveke xwerû kurdî ya etno-spesîfîk, peyva dengbêj, hem ji aliyê xelkên deverên din ve, hem jî ji aliyê derdorên siyasî, çandî û îdareyên herêmî ve bi rihetî hate qebûlkirin û bi demê re li herêmên cuda di nav îcrakarên kilamên kurdî de hate bikaranîn ku berê xwe wekî dengbêj terîf nedikirin. Helbet, danûstandinên tabîî yên îcrakaran ji berê berê de hebûn, bo nimûne ji ber karê karwaniyê, karên demkî, seferberî û ji salên 1960î şûnde jî ji ber sebebên cihêreng cîguhastin, koçkirina ber bi bajarên mezin û ya herî bi tesîr jî ji ber pêşketin û belavbûna alavên teknolojîk ên tomarkirina deng û radyoyê, îcrakarên herêmên cuda nêzîkî hevdu bûn, herçiqas hin ji wan bandoreke neyînî li ser wan hiştibe jî. Nivîskarên wekî Mehmed Uzun û Yaşar Kemal û berhevkarên qadê yên wekî Ahmed Aras (bi danasîna Evdalê Zeynikê) li Tirkîyeyê bal û eleqeya derdorên cihêreng kişandin ser çanda kurdî ya devkî û bi taybetî jî dengbêjiyê. Wer xuya dike ku berî peyva dengbêj ewçend berbelav bibe, peyvên cihêreng hebûn ku ji bo îcrakarên kilambêj dihate gotinê an jî ji aliyê wan ve wekî xweterîfkirinên xwemalî dihate îfadekirin. Ligel ku daneyên dîrokî yên zaf kevn li ber destê me nînin, em bi îcrakariya dengbêjan a destan û vegêranên kurdî yên kevn pê derdixin ku ev huner vedigere heta berî çend sedsalan. Dîsa jî dema meriv lêkolînekê li ser qeydên nivîskî yên ewil dike, meriv dibîne ku Mela Mehmûdê Bazîdî yek ji wan kesê ewil e ku derheqê cihêrengî û awayê îcrakariya vê çanda kilamgotinê û dawetên kurdan de melûmatên berfireh dide û behsa dengbêj, sazband û begzadeyan dike. Ji bo kurdan Mela Mehmûd dibêje ku “dengbêjêd wan heyin, bêrîtan dibêjîn” (Çelik, 2015: 160; Dost, 2010: 68-69). Ev behs li ser statu, kategorî û enstrumanên çanda dawetan agahiyên giring dide û di heman demê de behseke giring e ji bo dîroka vê peyvê.

Şair yek ji wan peyvan e ku xwedî hêz, prestîj û berbelaviyeke zêde ye. Ev peyv di heman demê de di nav şêwezarên cihê cihê yên wekî kurmançî, zazakî, soranî û hewramî de jî tê bikaranîn. Şair, hem li Serhedê û hem jî li herêmên din vê wateyê dide: kilambêjê/a afirîner ê/a ku dikare bi xamî (îrticalî) kilaman bibêje. Wate, peyva şair xwedî statu û prestîjeke bilind e di nav îcrakarên edebiyata devkî de û ev peyv li cem dengbêjên Serhedê ji peyva “dengbêj” binirxirtir e, lewra ew îşaretê bi afirînetî û hostatiyeke berçav (Evdalê Zeynikê, Şêx Silê, Gulê û Pero û hwd.) dike lê dengbêj tenê dikare veguhastina sermiyan/barê dengbêjê berê rabike/hilgire.

Sazband, peyveke din e ku hem li gelek herêman peyda dibe hem jî wateyên cihêreng werdigire. Herçiqas berbelav be jî, meriv dikare bibêje ku navê sazband(î), herî zêde li herêma Berfîratê dertê pêş û li derdorê vê herêmê zêdetir xuyanî dibe. Li vê herêmê sazband wekî îcrakar ji gçend kesan re tê gotin. Li vir

herçiqas navê sazband enstrumanê bîne bîra meriv jî, sazbandî her tim bi enstruman nîne, ew rasterast di dewsa peyva dengbêj/şair/kilamcî de tê bikaranîn. Li vê herêmê û bi taybetî li Sirûcê, peyva sazband dêvla peyva stranbêj de tê bikaranîn û sazband bi xwe saz an jî enstrumaneke din lînaxin. Me di vê xebatê de peyva sazband li ser çar kategoriyan parve kir wekî, a) kilambêjî û destanbêjiya bê enstruman, b) kilambêjî û destanbêjiya ku ligel amûrjenekî din tê îcrakirin, c) kilambêjî û destanbêjiya bi enstruman ji aliyê kilambêj bi xwe ve, d) sazbandiya bê kilam û gotin (enstrumental).

Aşiq, herçiqas di çanda tirkan de çanda aşiqtiyê gelek li pêş be jî, ev peyv di nav vegêranên kurdî yên devkî de jî cih digire û li herêmeke berfireh kesên ku bi vî navî îcrakariya xwe ya hunerî bi nav dikin, zêde ne. Bi taybetî li Berfîratê ev peyv berçav e. Herwiha peyva *kilamcî* ligel çend peyvên din li Efrînê û bi giştî jî li Berfîratê tê bikaranîn. Hin îcrakarên vê herêmê xwe wekî kilamcî terîf dikin. Bo nimûne, ji Besniya Semsûrê, Elî Dore ku bi salan hem bi kurmancî hem jî bi tirkî hunera xwe îcra dike, di nav xelkê de wekî kilamcî û aşiq tê nasîn.

Mitîrb û *begzade* jî li gelek deveran tîn bikaranîn ligel gelek navên bi heman an jî nêz-wateyê de. Ev peyv xwedî wateyên pejoratîf in li hin deveran, lewma meriv dibîne ku li hin herêman navên hurmet û rûmetê li wan tê dayîn da ku ew wateyên pejoratîf xuya nebin. Li Serhedê begzade bi vî rengî ye. Herwiha peyva axa ku xwediyê payeyeke bilind e ji bo muzîsyenên herêmî tê bikaranîn ku di şahî û dawetan de wekî gewende û dûmanan kar dikin. Bi vî rengî di nav çanda kurdî ya devkî de meriv dikare bi dehan navên tîkildarî van îcrakaran bibîne ku hin ji wan bûne xwedî taybetmendiyan xweser û herêmî. Di nav çanda kurdî ya devkî de leheng/karakterên muzîsyen, bi taybetî mitîrb di gelek destan û kilaman de jî rolên giring werdigirin ser xwe. Dîsa li Efrînê nofeke muzîsyenan a bi navê kirfî heye ku pîk, zemir, zurne û bilûrê dixin û wekî komeke serbixwe tevdiqerîn û pîranî bi kurdan re nazewicin. Dîsa hate dîtin ku li vê deverê ji bo hin îcrakaran navê qurbet an jî qîrbet jî tê bikaranîn.

Bi giştî meriv dikare bibêje ku termînolojiya cihêreng a kurdî, mîrateyeke çandî ya dewlemend e û cihêrengiya herêmî destnîşan dike. Hin term li hin deveran taybetmendî û pratîkên herêmî an jî statuya civakî û awayê îcrakariyê nîşan didin. Bikaranîna peyva *dengbêj* wekî kategoriyeke standart û şemsiye li ser hemû binavkirinan, cihêrengiya binavkirinên kurdî piştguh dike û ev jî dibe sebeb ku xwe-pênasekirinên cihêreng ên çandî di xebatên vê qadê de bîhmalîkin. Ji bo têgihîştîneke kûr a cihêrengiya edebiyata kurdî ya devkî, divê lêkolînerên vê qadê binavkirin û xwe-pênasekirinên herêmî piştguh nekin û wateyên wan ên herêmî jî vekolin û derxin meydanê.

Çavkanî

- Akgül, H. (2024). Morfema “-î”yê di peyvsaziya Kurmancî de. *Kurdiname*, 10, 156–170. <https://doi.org/10.55106/kurdiname.1448052>
- Alan, R. (2015). Dengbêj(î) û helbesta gelêrî. *Wêje û Rexne*, 4, 9–21.
- Allison, C. (2001). *The Yezidi oral tradition in Iraqi Kurdistan*. Richmond: Curson Press.
- Aras, A. (2018). *Şairê Kurda yê efsanewî: Evdalê Zeynikê*. Stenbol: Nûbihar.
- Arslan, M. (2025). *Kurd, kitêb, çapxane: Weşangeriya kitêbên Kurdî di dewrê Osmaniyan de (1844–1923)*. Wan: Peywend.
- Arta. (2023, July 29). *Hevpeyvîn bi hunermend Ekrem Nazî re* [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=w1DTKqda56A>
- Aslan, M., & Ismail, F. (2025). *Koleksîyona hîkayet û kilamên Tûr Abidîn û Botanê*. (Albert Socin & Eugen Prym, Transkrîpsiyon û nirxandin). Ankara: Wardoz.
- Bakşî, S. (2019). *Öyküleriyle Dersim kılamları ve Dêrsim şairi: Uşenê Kalmemî (1887–1964)*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Bascom, W. (1965). The forms of folklore: Prose narratives. *The Journal of American Folklore*, 78(307), 3–20.
- bavê lawin. (2020, April 2). *سلو کورو، سلطانه* [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=4bllXun3B_w
- Behary. (2022, April 28). *Mehamed pîru saîd xanê kerr u lawko radîwa Duhok مه‌حه‌مه‌دپيرو سه‌یخانێ کهر و لاووکو ل‌رادیاوا دهوک* [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=QqFNClS3fTk>
- Berekat Özmen. (2024, April 15). *Reşîto Tajdîn Mence Arşîva Şemdine Bakısyani berebin* [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=M-LnrwKhfhU>
- Bilbil, M., & Oztirk, M. (2019). *Rêzimana Mela Mehmûdê Bazîdîyî: Tûhfetü'l-Xîlan Fî Zimanê Kurdan (Nirxandin-Metin-Faksîmîle)*. Stenbol: Weqfa Mezopotamya.
- Blum, S. (1972). The concept of ‘Asheq in Northern Khorasan. *Asian Music*, 4(1), 27–47.
- Bocheńska, J. (2022). From Dengbêj to modern writer: Heritagization of the Kurdish oral tradition and revitalization of the Kurdish language in the works of Mehmed Uzun and Mehmet Dicle. *Iranian Studies*, 55(4), 899–927.
- Boyce, M. (1957). The Parthian Gôsân and Iranian minstrel tradition. *Journal of the Royal Asiatic Society*, 89, 10–45.
- Çaçan, S. R. (2013). *The Dengbêjî tradition among Kurdish Kurmanj communities: Narrative and performance during the late nineteenth and twentieth centuries* (Master’s thesis). İstanbul: Boğaziçi University.
- Çakır, A. (2022). Shifts in the stature of professional music-making in Kurdistan (or how Kurds from around Mardin became professional musicians). *The World of Music*, 11(2), 25–64. <https://www.jstor.org/stable/27159529>
- Çelik, M. (2015). *Adat û Rusûmatname’ê Tewayîfê Ekradiyeya Mela Mehmûdê Bazîdî (Metn û Lêkolîn)* (Unpublished Master’s thesis). Mardin Artuklu University.
- Celîl, O., & Celîl, C. (1978). *Zargotina Kurda II*. Moskova: Naûka.

- Celîl, O., & Celîl, C. (2014a). *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 1*. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê – Wien.
- Celîl, O., & Celîl, C. (2014b). *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 2*. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê – Wien.
- Celîl, O., & Celîl, C. (2016). *Zargotina Kurda: Êpîk û Dastan 3*. Vienna: Înstîtûta Kurdzanîyê – Wien.
- Cengiz, D. (2010). *Dizeleriyle tarihe tanık Dersim şairi: Sey Qaji*. İstanbul: Horasan Yayınları.
- Chyet, M. (1991). 'And a thornbush sprang between them': Studies on 'Mem û Zîn', a Kurdish romance (Unpublished Ph.D. thesis). University of California, Berkeley.
- Chyet, M. (2003). *Kurdish-English dictionary: Ferhenga Kurmancî-Inglîzî*. New Haven and London: Yale University Press.
- Çîçek, A. A. (2024). *Di reng û vengê Gimgimî: Cemalê Dursî û Xidirê Başî*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Çîçek, A. A. (2024). *Şaîrê Gimgimî yo vindîbîyaye: Silê Musî (1889–1952)*. İstanbul: Vate.
- Çobanoğlu, Ö. (2023). *Türk dünyası epik destan geleneği*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Darati, S. R. (2023). *A world through words: Dengbêjî, kilam and collective memory* (Ph.D. thesis). Georg-August-Universität, Göttingen. <http://dx.doi.org/10.53846/goediss-10178>
- Delikaya, Ö. (2023). "Aşiqê Eşqê": Dengbêj û sazband Xalidê Xendeqa. In O. Bozan, A. Ertekin, A. Cengiz, & A. Kaçmaz (Eds.), *Cumhuriyetin 100. yılında Ergani: Din-eğitim-kültür* (pp. xx–xx). Bursa: Ekin Yayınevi.
- Delikaya, Ö. (2024). Nû-varyanteke Mem û Zînê ya Dengbêjê Elaşgîrî Kazoyê Garîsyâ: Nirxandîneke pêwendî û bernivîsandin. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 12(3), 1197–1226.
- Delikaya, Ö., & Ertekin, M. Z. (2021). "Li Geliyê Çatê Tav Dizirîqî": Topogeny û nexşeya devkî di kilama Elî Xarza de. *Kurdiyat*, (3), 11–25.
- Dîkranyan, M. (2024). *Çirayê Ironî Lûwî û Lûwîyî (Tîpguhêzî û Hemançap)* (A. Yiğitalp, A. Gebenlioğlu, İ. Çağatay, S. Bozkurt, & T. Baykuşak, Eds.). İstanbul: Sena Ofset Ambalaj, Matbaacılık San. ve Tic. Ltd. Şti.
- Dost, J. (2010). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye Mela Mehmûdê Bayezîdî*. Stenbol: Nûbihar.
- Düzgün, M. (1992). *Taê Lawîkê Dersîmî / Dersim Türküleri*. Ankara: Berhem Yayınları.
- Ertekin, Z. (2019). Du reng û yek deng di Kurdî de: Dengbêjî û Qesîdebêjî (Ceribîna berawirdeke kurt). In İ. Baz, R. Öz, Ç. Ertaş, & İ. Tunç (Eds.), *Dengbêjlik kültürü ve dengbêjler (Uluslararası Sempozyum Bildirileri)* (pp. 605–631). Şırnak: Şırnak Üniversitesi Yayınları.
- Farqînî, Z. (2022). *Ferhenga Kurdî–Tirkî*. Stenbol: Enstituya Kurdî.

- Fawzy, F. O. (2023, December 2). نوري شيخو، خورزه محمد – Nurî Şexo, Xorze Mehammêd [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=cs4ycG3WveM>
- Ferdeghini, G. (2022). Performance e melodie nell'epica curda cantata: Il caso di Beyta Dimdim nel Bahdinan (Iraq). *Philomusica on-line*, 21(2), 289–329. <http://dx.doi.org/10.13132/1826-9001/21.2179>
- George, M., & Çakır, A. (2022). New contours in Kurdish music research. *The World of Music*, 11(2), 5–24.
- GezGozok. (2022, March 18). Zimanê Domanî, Silemanê Dengîzî û Keça wî [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=gQsZpO_8xLI
- Greve, M. (2018). Neither aşık nor dengbêj: The lament singers from Dersim. In U. Özdemir, W. Hamelink, & M. Greve (Eds.), *Diversity and contact among singer-poet traditions in Eastern Anatolia* (pp. 95–130). Baden-Baden, Germany: Ergon Verlag.
- Gültekin, M. (2013). *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û destanên epîk ên dirokî, mîrxasî û serhildanan*. Stenbol: Avesta.
- Güneş, Ö., & Şahin, İ. (2019a). *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso*. İstanbul: Nûbihar.
- Güneş, Ö., & Şahin, İ. (2019b). *Antolojiya Dengbêjan 2: Dengbêj Şakiro*. İstanbul: Nûbihar.
- Güneş, Ö., & Şahin, İ. (2021). *Antolojiya Dengbêjan 3: Dengbêj Huseyno*. İstanbul: Nûbihar.
- Hale, T. A. (1997). From the Griot of Roots to the Roots of Griot: A new look at the origins of a controversial. *Oral Tradition*, 12(2), 249–278.
- Hamelink, W. (2016). *The sung home: Narrative, morality, and Kurdish nation*. Leiden & Boston: Brill.
- Hamelink, W., & Barış, H. (2014). Dengbêjs on borderlands: Borders and the state as seen through the eyes of Kurdish singer-poets. *Kurdish Studies*, 2(1), 34–60.
- Hatun Sürücü, S. (2024). Di navbera nerît û teknolojiyê da: Jiyan û hunera aşîq û sazband Elî Dore. *Kurdiname*, (11), 75–95.
- Hooshmandrad, P. (2022). Religious musical knowledge and modes of transmission among the Kurdish Ahl-e Haqq of Gurân. *Oral Tradition*, 35(2), 341–362.
- İlengiz, Ç. (2022). The aesthetics of open-ended mourning: The statue of a holy-madman in Dersim, Turkey. *Journal of Material Culture*, 27(4), 396–413. <https://doi.org/10.1177/13591835221132494>
- Jindires. (2007, December 25). *Jindires adik efrin طمبور ادیک کوران اسره موقع جندريس* [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=beyZ4nx7Z7I>
- Jindires. (2012, May 8). *مەم جوجان عەربا صالح بک خانە* Mem Çûcanê, Ereba Salih Begê. Terqolo, Xan [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=vgrUnughVso>

- Jindires. (2013, April 1). Adik Efrin Tembura Resen [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=Xo4JhocaoHI>
- Jindires. (2019a, July 22). Bavê Seydo: Eyşa îbê , بایفی سیدو عیسا ایبه [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=9CQXGjQw_hg
- Jindires. (2019b, January 3). Henanî evdê şerê, لای برارو law birawo [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=TyvUslqLK8U>
- Jindires. (2019c, February 24). Hesnazî: Cebelî [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=TDvR2d-JsJo>
- Jindires. (2022a, March 6). Ferza çola (Ereb Hemadî)= رشید جندو فرزا جولاً =عرب حمادی Reşîdê Cindo [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=h7lzlX-1PLc>
- Jindires. (2022b, March 13). Derwêşê evdî, Reşîdê Cindo درویشی عفدی روایه رشید [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=vXy7lfY6Tml>
- Kaniya dengbeja. (2022, August 6). Dengbêj Reso – dû heb qesîde beyît [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=QdYWKPVUJSE>
- Kaplan, Y. (2023). Ji edebîyata devkî ya Kurdî serhatîyek evînî: Salih û Kejê û deqeke çapkirî. *Mukaddime*, 14(2), 416–442.
- Karasu, D., Hülakü, A., Korkmazcan, O., Güleriyüz, D., & Kardaş, Ö. (2017). *Bingöl Dengbêjleri*. İstanbul: Peri Yayınları.
- Kardaş, C. (2017). *Aşığın sazı, dengbêjin sesi: Dengbêjlik ve âşıklık üzerine karşılaştırmalı bir inceleme*. Ankara: Eğiten Kitap.
- Kardaş, C. (2019). The legacy of sounds in Turkey: Âşiks and dengbêjs. In U. Özdemir, W. Hamelink, & M. Greve (Eds.), *Singer-poet traditions in Eastern Anatolia* (pp. 37–51). Baden-Baden: Ergon Verlag.
- Keskin, N. (2016). *Müzik, anlatı, kimlik: Tûr-Abdîn'de bir anlatım biçimi olarak mîtrîplîk*. Ankara: Gece Kitaplığı.
- Keskin, N. (2019). *Folklor û edebiyata gelêrî*. Stenbol: Avesta.
- Kînas, A. (2020). İdealize edilmiş yekpare dengbêjlik karşısında dengbêj-tipi icracıların bölgesel çeşitliliği. *PolilitArt*, (286), 4–5.
- Kurdên Alawî. (2015, August 23). Aşiq Davut Sularî – Hesên Musa (Kürtçe Uzun Hava) [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=hTik5sLj3Tw>
- Le Coq, A. von. (1903). *Kurdische Texte*. Berlin: Reichsdruckerei.
- Meretowar, A. (2017). *Huseynê Farê (Jîyan-Kilam)*. Stenbol: Wardoz.
- Mürer, G., & Çakır, A. (2022). Introduction: New contours in Kurdish music research. *The World of Music*, 11(2), 5–24.
- Omer Yaxî. (2011, April 30). *Ismaşil sardashti u faxir harire yadi baxer* [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=BiQ-HCdFEQ8>
- Özdemir, U., et al. (Eds.). (2018). *Diversity and contact among singer-poet traditions in Eastern Anatolia*. Baden-Baden: Ergon Verlag. <https://doi.org/10.5771/9783956504815>
- Parlîti, A. (2006). *Dengbêjler / Sözü'n yazgısı*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Polatdersim. (2009, June 6). *Aşık Davut Sulari – Ha wayiro* [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=8FpKOg9fjPM>

- Reichl, K. (2022). *The oral epic from performance to interpretation* (1st ed.). New York & London: Routledge.
- Şahin, T. (2016). *Lawîkê Qerebêli u Qoçgiriye*. İstanbul: Vejîyaişê Tiji.
- Sayım, İ., & Ertekin, M. Z. (2024). Yekemîn Încîla Kurdiya Kurmancî û hin taybetmendiyên wê. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 10(19), 16–31. <https://doi.org/10.56491/buydd.1413575>
- Scalbert-Yücel, C. (2009). The invention of a tradition: Diyarbakir's Dengbêj Project. *European Journal of Turkish Studies*, (10). <http://journals.openedition.org/ejts/4055>
- Schäfers, M. (2015). Being sick of politics: The production of dengbêjî as Kurdish cultural heritage in contemporary Turkey. *European Journal of Turkish Studies*, (20).
- Sträuli, B. (2017). Dewrêşê Evdî - Dewresh, son of Evdi: A Kurmanji epic as performed by the Berazi singer Baqî Xido. In *Dewrêşê Evdî - Dewresh, son of Evdi*. Wiesbaden: Harrassowitz Verlag.
- Sträuli, B. (2021). “Our steppe is vast ...”: Kurdish epics and tribal stories from Urfa, 1906 collected by Oskar Mann. Wiesbaden: Harrassowitz Verlag.
- Subaşı, K. (2022). Pirnavîya cureyên vegêranên gelêrî û nestandartbûna wan di Kurdî de. In *Folklorê Kurdî: Wêje, Ziman, Mêjû, Cîvak û Kelepûr* (pp. 527–552). Zakho: Senterê Zaxo bo Vekolînên Kurdî.
- Taş, C. (2017). *Kilamê Kirmanciyê: Dersim halk ezgileri*. İstanbul: Tij Yayınları.
- Turgut, L. (2002). *Cembelî fils du prince de Hekkarî et la tradition des Mitirbs* (Unpublished master’s thesis). Institut National des Langues et Civilisations Orientales, Paris. <http://www.uni-goettingen.de/de/138346.html>
- Turgut, L. (2018). Imagining a new mitirb: A text analysis of a singer-poet tradition in Tûr ‘Abdîn. In U. Özdemir, W. Hamelink, & M. Greve (Eds.), *Diversity and contact among singer-poet traditions in Eastern Anatolia* (pp. 53–76). Baden-Baden: Ergon Verlag.
- Uzun, M. (1991). *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*. Stockholm: Weşanên Welat.
- Uzun, M. (2006). *Dengbêjlerim*. İstanbul: Belge Yayınları.
- Waar Media. (2023, January 31). Taveheyy – Hesên Elî Xencer | تافهه‌ه‌یف – ه‌س‌ن ع‌ل‌ی خ‌ن‌ج‌ر [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=fR1w-7BnoBc>
- Yaş, Z. (2016). *Şakarên Muzîka Kurdî-2*. İstanbul: Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê.
- Yazar, Î. (2018). *Çimê Aşikan ra Hewt Hikayeyê Gelêrî*. Diyarbekir: Roşna.